Edebiyata Kurdî ya gelêrî, huner û pişeyên Kurdî, motîvên Kurdî, neqşên Kurdî, muzîka Kurdî, stran û kilamên Kurdî û mîtolojiya Kurdî wisa hev diqedînin (temam dikin), ku tu dibêjî qey folklorê devkî, folklorê objektîfî terenûm dike. Çawa ku gava av hêlm dide, ber bi ewran ve hildikişe, li ewran tîr dibe û dîsa dibe av û dadikeve jêr, wêjeya zaroginî jî dema tîr û nêrbar (somut) dibe, ew gav dizivire muzîk, motîv û neqşê.

Dema ku rindahî, neqîş, motîv, pêşdarî (menzere) tunebin, hest (duygu) û melheze jî pêşve naçe. Dema hest û melheze jî pêşve naçe, edebiyat jî çênabe.

Berhem û nîrxên gelêrî yên edebî û hunerî, bi tenê ji bo wî gelê nîne, herweha jo bo bextewerîya gelên dinyayê ye jî."

Feqî Huseyn Sagniç di axaftina xwe ya li ser zimên de, dabaşa dewlemendiya zimanê Kurdî dike û li ser pêşveçûnê radiweste. Feqî Huseyn, di axaftina xwe de gelek mînakên balkêş dide û wiha dibêje:

"Çawan tê zanîn ku her demekê, mirov ji candarên din cuda tekûstir bûne. Di serê wan de hiş hebûye û bi ewa li hev serwest kirinê xebitîne. Pêşî bi hêmayan (îşaretan) hevdû serwest kirine. Hê jî em beşek ji wan hêmayan bikartînin. Piştî van hêmayên (îşaretên) curbicur mirov hêdî hêdî bi alî dangan ve çûne.

Roja ji alî mirovan ve deng hatiye bikaranîn, çanda stran, lawje, dîlok û mûzîkê jî dest pê kiriye. Di ey-

nî gavê de bi alî folklorê ve jî gav hatiye avêtin. Hêdî hêdî dest bi govend û semayê jî hatiye kirin. Bizanin ku ziman, çand û folklor bi hev re destpê kirine û bi hev re jîna xwe domandine û wê bi hevra bimeşin jî.

Ziman ji dengên xwerû bi alî kitan ve, kîte bi alî peyvên ve û peyv jî bi alî hevokan ve çûye. Xwezayî (tabî) ku ziman di her gehînekek de bi sedan sal heya bi hezaran sal rawestayê û hêdî hêdî bi alî tekûsiya xwe ya îro ve hatiye. Ziman çawan di rojek, salek, sedsalek û hezarsalek de bi vî awayê ku îro di devê me de hefî tekûs nebûye û nehatiye himatê, çand û folklorê gelan jî welê ye. Nexwe çand û çanda stran, lawje, dîlok û folklorê di tanga ziman de û bi ziman re, heya bi ziman ve, roj bi roj tekûstir bûye, xwe gihandiye roja me. Heya gelê Kurd li dinê hebe, dê folklorê wî jî mîna wî hebit. Heya dinya jîna xwe bidomîne, gelê Kurd bi folklorê xwe ve, dê tê de bijîn. Gel ji dinê, ziman ji gel, folklor jî ji zimên nayên cuda kirin.

Hindek mirovên netewên serdest, xwestin ku Kurdan bipişêvin, heya çare di destê wan de hefî mezixandin (xerc kirin), lê ji hinek zerran zêdetir, nikarin tu li Kurdan bikin. Îro jî Kurd digel çand û folklorê xwe ve li ser pêya ne û nakeve jî. Ziman, çand û folklorê Kurdan pir dewlemend e. Heger beşek ji wan hatibe ji bîr kirin jî, vaye hêdî hêdî derdikeve himatê û vaye "Navenda Çanda Mezopotamyayê" vî karî pêk tîne. Ûmîdwar im ku dê serkeve jî.

Çand û folklorê dewlemend pzo ji zimanê dewlemend derdikeve. Hûn dizanin ku vaye çend salek e li ser zimanê me şer tê kirin û çand û folklorê me tune tê jimartin. Dewletên serdest peyv, stran, lawje, gotinên mezinan, methelok (metalok), dîlok, çîrok û mamikên me ji me didizin dibin, ji xwe re dikin mal û "malê me bi xwe ye" dibêjin. Xwezayî di van dizînan de alîkarî ji hinek bextreşên me distînin. Ew Kurdên



bextreş ên bê esil jî, qet şerm û fihêt nakin, çand û folklorê xwe, emek didin, werdigerînin û dibin herwe pêşkêşî dijmin dikin. Bi van dizî û pizîyan ziman, çand û folklorê Kurdî nikarin kêmin kin.

Zimanê Kurdî jî edebîyatê re vekirîye. Bê enegel her celebên edebî pê têne nivîsandin. Nema-ze jî risteyên bi qafîye re.

Zimanê Kurdî zimanekî gelek bedew e. Yek ji bedewiya wî, ev folklorê curbecur a bedew e. Ev celebên bê hejmar yên folklorê Kurdî hemû bi hevdu re ahengî ne û bi mûzîkên xwe re jî ahengî ne. Heger kêmasîyekî teknikî di zimanê me de hebûya, evqas folklorê tekûsê ahengî ne dikarîya ji nav xwe derxista. Gava di zimanek de kêmasîyek teknikî hebe, ew kêmasî di folklorê de derdikeve himatê (holê). Rojê mirovekî folklorzan bi ser min ve hat, min

jê pîrsa hejmara govend û sema yên Kurdan kir. Ji min re "hejmara wan bê kêmasî nayê zanîn. Lê ji hezaran zêdetir ez pê dizanim û her yek ji wan bi awayek tete leyîstin. Lê di nav hemûyan de ahengîyek yekrû jî heye. Ji xwe, saya wê ahengîyê ye ku di van mercên gran de jî folklorê me roj bi roj dewlemantir dibe û pêşve diherike. Ew celebên ku nû derdikevin, mirovên zana û pispor dizanin ku parçê kîjan govend û semayê ye", got.

Vaye Navenda Çanda Mezopotamyê li ser vê govend û semaya dewlemantir ê pirejmar dixebite ku yên windabûyî peyda bike û yên herêmî dervazê herêmên din bike. Ji bakûrê Kurdistanê heya başûr û ji rojhilatê heya rojavayê, hemû bi folklorê xwe bizanin û bi vî awayî yekîtiya folklorê bête himatê. Dikarim bibêjim ku di der-

barê ziman û folklorê me de, Kurd ketine rûnesansa xwe û Navenda Çanda Mezopotamyayê jî pêşdarîya wê dike.

Ziman ne binavayî ye û ne jî seravayî ye. Bi wergerandin û guhertina sazimanan ziman dewlemantir dibe. Lewra sazimanên nû peyv, gotinok, biwêj (terîm) û methelokên xwe lê zêde dikin. Ango piştî zimanan qalibê xwe girtin û şûn de, êdî naguhere. Tenî dewlemantir û tekûstir dibe.

Vê yekê qenc bizanin ku folklor jî mîna zimanan ne guherbar e. Ango bi guherandina sazimanan folklor naguhere.

Folklor jî mîna zimanan dewlemantir dibe û pêş de dihere. Lewra ziman û folklorê sazimanan tune. Ziman û folklorê gelan heye. Ango ziman û folklorê malê gelan bixwe ye. Heya ew gel li rûbarê dinê bin, dê ziman û folklorê wî jî bi wan re be."

ZMAN Û RASTNIVIS

F. Huseyn SAGNIC

Rastnivis (imla) dibêjine sazandina tîpan, tesbîta krîna cîderka tîpan, ewayê derketina wan, pêkhatina peyvên û hevedudaniyan, cîkirina tîpan di peyvên û hevedudaniyada, cîkirina peyvên û hevedudaniyan di hevokanda, bî hevedanîna hevokan û çend hevokê bigîhîne hevdu hevokêkên mezin çêkirinê. Şxwe navê wê li sere, "rastnivis" anî rast nivîsandina peyvên, hevokan, peve grêdana peyvên û hevokan.

Di serê peyvanda an jî di kita (heceya) serê peyvanda, cigirtina tîpa "î".

Şxwe nisbet bédengan, peyvên Kurdi yê bi dengdêran destpê dikin hindikîn. Lê peyvên Kurdi yê bi dengdêrên "î, u" destpê bikin hêç nînin (tunenîn). Pzo di serdestpêkên wan çend peyvên ku jî zmanê biyani ketine Kurdîda tîn. Hejmara wan peyvên biyani jî hindikîn.

Pîştî ola îslamê, bî wasîta mrovên oli, bî ewayek nedîst, dengdêra "î, u" anîne serê hinde peyvên. Ew jî anîne serê wan peyvên ku wê demê bî tu ewayî nekarîne, dengdêra "î" li dû bédengên serîda cî bikin. Minak: Ustû, ustûn, usa û êd... Istîrik, îstîran, îstêrk û êd... Paşî xerezkarî, dengdêra "î" li dû bédenga serê peyvanda cî krî. Minak: sitû, sitûn, wîsa, sitîrik, sitîran, sitêrk û êd... Heker hindîk jî be, hê jî di hinde herêmanda bî van her du ewayan jî tê bikaranîn.

Bî vî ewayî mebesta xerezkarî, di vê devrêda pêkhat. Lewra Ereban, "Kurd Erebin" û Tîrkan jî "Kurd Tîrkî" di gotîn. Halkubo di zmanê Erebi û Tîrkîda, peyvên bî du bédengan destpê bikin hêç nînin (tunenîn). Heçî di zmanê Kurdîda, peyvên bî du bédengan û bî sê bédengan jî destpê bikin hen û prî jî. Jî bo ku Erebi û Tîrkî vê misogerîyê (heqîqetê) jî hmatî rakî, ev sextekarî xistin nav zmanê me. Divê bête zanî ku di derbarê zmanê meda sextekarî û fêlbazîya wan ne ev tenîye. Lê jî vê mjarêra (mewzûira) ev tenî peywîstbû.

Di zmanê Kurdîda, peyvên bî sê bédengan destpê dikin û graniya Kurdîstanê jî bikartînin, evî: stran, strû, stîkur, strî...

Peyvên bî du bédengan destpê dikin: şkestî, şkinandî, stû, stûn, stî, drîk, drî, çra, çvîk, brîk, brî...

Peyvên bî du bédengan destpê dikin û yê ez jî mir Celadet Bedîrxan hewîsîme: Zman, zmin, zlam, zlik, bra, bla, klam, klol...

Peyvên me yê bî sê bédengan destpê bikin ne zehfîn. Lê yê bî du bédengan destpê bikin prî û yê ku ez jî mir Celadet Bedîrxan jî hinbûme ne ew qasê jorînî. Tenî jî bo numone mî çend minakê dane. Yê dî li wanê jorîn tîne qîyas krî.

Xwendevanê hêja! Pîştî ev misogerîya (heqîqata) han ku mî zani, êdî ez bî hêzekê gran sedî sed li ser vê mjarê xebîtim. Heger li ser wan notê mî yê xebata di vê mjarêda tvaq ne hatîbûya, îro di dest meda bûya, hîm dê bibûya heyret krîna wê xebatê, hîm jî dê ronahî bîdaya xebata me ya îro. Tam deh sal ev xabat di destê mînda rawesta. Paşî mî notên xwe yê deh sale berhîvand (berhev kir) û ev bîyara jêrî da. Heger jî alî ne xerezkarave kêmasî di bîyara mînda bête ditî, ez jî bersîvdana wanra amademe.

Di kita serdestpêka peyvanda bikaranîna dengdêra "î" :

Heker peyvî pîr kite be, pîştî bédenga duwem dengdêrê hebit, li navber her du bédengên serê peyvên, tîpa "î" nayê danî. Minak:

Bzav, rcaf, tvîk, brîk... ne ku:

Bîzaf, rîcaf, tvîk, brîk...

Hne peyvên me, gava qurmê peyvê tenî tê bikaranîn, tîpa "î" cî digîre, gava li qurmê peyvê tîp tînê zêde krî tîpa "î" radîbe û ev çêbûn û pêkhatîna han qaydê me naherfîne. Mîna:

Bîn, kîn, jîn, fîr...

Bnê darê, kna mîn, jna te, fra teyrê...

Gava bédenga duwemin jî bédenga yekemin be, hînga lî navber her du bédengan danina dengdêra "î" peywis-tiye. Lewra dî rastnivîsa zmanê Kurdîda, du dengên jî hev, bî tu ewayî dî peyvekda nayên cem hev û gava dî pey-vên hevedudanîda rastî hev bîn yek yeka dîn dadîqurçîne. Dî vîrda, dabaşa me lî ser dî peyvekda du tipên jî hevin. Mina:

Çîçîk, jîjû, jîjan, dîdo...

Sîsê, dîdan, zîzê, nînê...

Gava peyv, yek kite bîr, ew kite an bédengek tenî be, an jî du bédeng bîn û bî wanve dengêk dîn jî ne hatibe danin. Tîpa "î" lî dû bédenga pêşî ciye xwe digire. Minak:

Mîl, jîn, kîr, jî, çîr, pîr...

Lî, nîk, mîn, dîn, cîl, çîl...

Gava piştî bédenga duwemin bédengek dîn jî hebit, lî dû bédenga pêşî tîpa dengdêra "î" tête bîkaranîn. Mina:

Sîst, pîst, rîst, tîrş, nîft...

Tîftîk, tîrpan, xîstîn, mîştîn...

Ew çend libek peyvên me yên bî sê bédengan destpê dîkîn. Dî diroka kevnareda heya nha bî serfirazî jîna xwe domandîne, pêşberê pşavkeran şer krîne û xwe parastîne jî vê qaydê awertene. Mina:

Stran, strand, stkur, strû, strik...

Strîkok, strîbeloq, strîngeh, stvang...

Ev qaydên jî jor heya lî vîr hati şrovekirîn (îzah kîrîn) dî hîlbestê weznanda pêkneyên jî dibe.

Dî rastnivîsa Kurdîda ketîna tîpan.

Hîndek peyvên pîr kite ku bî bédengek dawî lê tê û dengdêra kita dawî jî "î" ye. Mina:

Remîl, mezin, kevin, tevîn...

Berîk, kavîr, selîk, kevrîr...

Ev celebên peyvân, gava bî serê xwe bîne bîkaranîn, şxwe çawan lî jorîn dîxwîyên wsan dîminîn. Yanî tu tîp jî wan nakevîn û gava qertafekê an jî peyvekê bédeng destpê krî jî bî wanve gîrt, disa tu tîp jî wan nakevîn û mîna xwe dîminîn. Mina:

Remîldar, mezinhebin, kevin saz, tevîner...

Berîkhûr, kavîrkîr, selîkfîroş, kevrîve...

Gava qertafekê an jî peyvekê bî dengdêr destpê krî, bî wan celebên peyvânve hate danin, hînga jî peyvân dengdêra "î" dikare bîkeve. Mina:

Remîla remîldar, meznê Kurdan, kevneguhez, tevna tevîneran...

Berkê tvingê, kavrên koçeran, selka trî, kevrê diwarê xanî...

Dubare tîp:

Dî rastnivîsa Kurdîda dubare tîp tune. Çawan sedî sed me dî Rewşen hejmara heftanda jî gotîbû ku dî zmanê Kurdîda, dî peyvekda du tipên jî hev nayêne cem hevdu. Gava dî peyvên hevedudanîda rastê hev bîn, ango tîpa dawî ya peyva pêşî û tîpa pêşî ya qertaf û peyva paşî jî hevdu bîn (-dubare bîn), hînga tîpa dawîya peyva pêşî dîkeve. Paşî her du peyv pev digîrîn û dîkevîne derença peyvekda. Mina:

Sîst-tîr = Sîstîr, paş-şîv = paşîv, lêv-e = lêve danî...

Tving-gîr = Tvingîr, Saz-zende = Sazende, he-ve = Heve...

Dehol-lêx = deholêx, dî gund-da = dî gunda, rîk-ker = rîker...

Çav-vekîrî = çavekîrî, dî vîr-ra = dî vîra, dad-dar = dadar...

Dî vê mîjara tîp ketînêda, gava jî tipên dubare yek dîkeve, her wekî dî ciyê wêda şdanekê svîk dîxwîyê. Bizanîn ku ew ne standînekê svîke jî. Tenî velêxkekê normale.

Tipên têvel yan jî cîhderkek, an jî yê cîhderkên nêzikên hevdu, dî peyvekda lî cem hev nayên. Gava dî peyvên hevedudanîyên jî du peyvân, peyv qertafek û peyv daçkekda rîstî hev bîn, tîpa dawîya peyva pêşî dîkeve û tîpa pêşî ya peyv, qertef û daçeka paşî him ciyê xwe him jî ci yê tîpa ketî ya dawîya peyva pêşî digire. Mina:

Dest-drêj = desdrêj, tîvîg-kîr = tîvînkîr...

Goşt-dar = goşdar, derd-tîr = dertîr...

Tnaz-saz = tnasaz, bab-pîr = bapîr...

Kep-blînd = keblînd, mîrîşk-gîr = mîrîşgîr...

Gava tîpa dubare, tipên jî cîderkên hev û tipên cîderkên nêzikên hev dî du peyvên cudada rastên hevdu bîn,

her çqas neyên xwendin ji têne nvisandin. Tîpa dawîya peyva pêşîye nayê xwendin. Mina:

Nvisandin	Xwendin
Find dani	Fn dani
Serhîng kîr	Serhîn kîr
Ez jê têm	Jê têm
Şêst dep	Şês dep
Sed dar	Se dar

Ew peyvên pîr kite yê bi dengdêra "i, û" yê biqêdîn û "y"ya kelijandinê ji girtîbîn, her çqas carna ew "i, û" nayê xwendin ji lê nvisandin peywistiye. Mina:

Peyv	Nvisandin	Xwendin. 1	Xwendin. 2
Seri	seriyan	seriyan	seryan
Keri	keriyan	keriyan	keryan
Deri	deriyan	deriyan	deryan
Mali	maliyan	maliyan	malyan
Bari	bariye	bariye	barye
Çarsû	çarsûya me	çarsûya me	çasya me
Xesû	xesûya te	xesûya te	xesya te

Lî hev ciguhertina tipan:

Dî zmanê meda ciguhertina tipan gelek grînge. Ev ciguhertina tipan, dî hindekanda her wekî herêmi û an jî kêfî dixwiyê û lî ser wan jî biryar dan gelek koteke. Bêweku hnek ci "mrov" û hnek ji "mrof" dibêjin. Disa hnek "ghij-tim" û hnek ji "ghiştim" dibêjin. Ev şrovekirina jorin, gelek ez westandim. Têgih guhertin min têda nedit û lî ser herêmi ya wê jî min nekari biryar bîdim. Ev bûyer jî min dî nav lî hev ciguhertina tipanda şrovekir. Lî ser van mjaran emê lib û lib rawestîn û heya bîkarin bihêjin. Mina:

- L - r** Carna lî hev ci diguherrin.
Alikar / arikar, felemez / feremez, glol glor...
- v - f** Carna lî hev ci diguherrin.
Mrov / mrof, hevt / heft, hevsar / hefsar, kevçî / kefçî...
- v - b** Carna ci lî hev diguherrin.
Bav / bab, xoşav / xoşab, gulav / gulab, kevani / kevani...
- z - s** Carna lî hev ci diguherrin.
Lezgin / lesgin, gezt / gest, leyz / leys, gevaz / gevast...
- j - z** Carna ci lî hev diguherrin.
Jirek / zirek, lmêj / limêz, jeng / zeng, zegar / jengar...
- j - ş** Carna lî hev ci diguherrin.
Kujan / kuştin, ghijtin / ghiştin, rahijan / rahiştin...

Ev ciguhertina peyvan, belê grînge. Lê ne pîr frehe. Ango, jî hevdu kêmi û zêde hene. Lê her yek dî çend peyvekda dixwiyên, bîkaranina wan û jî hevdu veqetandina wan jî gelek koteke.

Ciguhertina tîpa kurt û drêj:

Carna dengdêrên kurt dikarin ciyên xwe bîdîn dengdêrên drêj: Gava lî nivhend, an jî lî dawîya hinde peyvan û lî dû dengdêrek kurt bêdenga "h" hebe, ew "h" dikare bikeve. Lê bî wê mercê (şertê) ku dengdêra kurt ciyê xwe bîde dengdêra drêjê jî zayenda xwe. Ango "e" ciyê xwe bîde "a"yê, "i" ciyê xwe bîde "i"yê, "u" jî ciyê xwe bîde "û"yê an jî "o"yê. Mina:

- Çehv / çav, sehkirin / sakirin, xwehr / xwar...
- Cih / ci, sîh / sî, nh / ri, trîh / tri...
- Buhtan / Botan, duhtmam / dotmam, cuh / co / cû...

Bî awerti carna jî peyva "duht" tîpa "t" dikeve, tîpa "h" lî ciyê xwe dimîne û disa tîpa kurt ciyê xwe dîde tîpa drêj. Ango "u" ciyê xwe dîde "o"yê. Dî vê tintêla awertida, duht dibe doh, duhtmam diguhere û dibe dohmam. Gorê vê awertê geleke duhtxatî bibe dohxatî.

Peyva "xwehr" û "guh" neyê guhertin çêtire. Lewra gava tîpa "h" jî wan bikeve, têgihên din didin. Çî peyva tê-

gihêk din jê derkevit, neyê guhertit çêtire. Nemaze peyva "guh" gava bi vê qaydên jorin biguhere, têgihek qrêj jê derdikeve.

Divê bête zanin ku ev qaydê ketina tipa "h"yê di hêmana zmênda heye. Ne ku devokê herêmane. Her çqas iro hindêk hermên me tipa "h" têxin û hindêk ji nayxin bikartinin ji. Piştî zanina vê taybetiyê êdi ji her du qaydan, ki bi gj ewayî bikarbîne, divê em pêşber dernekevin. Dikarinm vê yekê ji bibêjim ku berî Kurdan hemî ji bê guhertin ew peyv bikartanin.

Kurtasiya vê beşê:

Di rastnîvîsa (imlayê) zmanê Kurdida, bi du bêdengî heya bi sê bêdengî destpêkirina peyvînan, ketina tipan û tunebûna tipa dubare, digel qayde û bandorên wan, divê gelek qenc bêne zanin û bêne ji ber krîn ji. Lewra ew zmanên ku di medrese û dbistananda seya (dersa) me pê dihate dan, zmanê Erebi û Tirkî, di wanda ev celebên qaydan, vajiyê zmanê meye. Em ji normalê zêde di bin bandora wan zmanên biyanida mane. Her weki ku di van deveranda zmanê me ji mîna yê wan bê taybetiyê, nikarin bihizirin. Divê em xwe ji bandora (tesira) zmanê biyanî nîzgar kin û demek zû fetilîne taybetiyên zmanê xwe.

Bi vi ewayî, li hev ci guhertina tipan û ciguhertina tipa kurt û drêj ji disa taybetiya zmanê meye.

Gava em zmanê xwe dahûrinin (tedqiq bikin), divê em bi Kurdî bihizirin (melheze bikin) ku bikarin çingilokên (teferuata) zmanê xwe bîzanin. Lewra her zmanekî xweyê brek taybetiyane û ew zmanên ji eynî malbatan bin hindêk taybetiyên wan yê nêzikê hevdu hene. Zmanê Kurdî, ne ji malbata zmanê Tirkî û Erebiye ku di navber wanda nêzikayek ji hebin.

Bi hêviya dahûrandina zmanê Kurdî, di hêmana Kurdida, bîminin xweş...

Têbîni : Di nîvîsara bêda dê dabaşa rastnîvisê bête domandî.

bilbil xistin qefesa zêrîn got: ka gula min a bi bîn

*Xwedî mal xwedî serwet lîngên çewtî
Mejiyên bê raman, guhên ker, çavên girtî*

*Pozên billind zarên girêday axayên pîs
Li dû zordar diçin li stûyê wan e werîs*

*Şorên xeyal bîr û bawerderew şêxên kevnepereşt
Bi dijmin re, ji gelê xwe re dibên "gelo hişt"*

*Kêf û zewqa derewîn ciwanên bê şexsiyet
Qefla dijmin li mejiyê xist bi niyet*

*Fîlm û fuhuş û faîz û fitkol ji faşîzm re qefes
Da ku bilbilê bixê tê de û bihêle bê nefes*

*Paşniyet e, bilbil bike dilbikol
Dûr bimîne qet nebîne bibêje "ax kanê qul"*

*Kor bike wê çav girêday poz xitimandî
Da ku nebîne bêhn meke gul bi zindî*

*Lê tarî ke, rojê bike herdem jê re şev
Qet nebîne, gul parî kin ew li hev*

*Got: "Bilbil xistin qefesa zêrîn
Got: nexêr kanê gula min a bibîn"*

*Ji wir girtin wî avêtin zindanê
Ew qîriya "gul û gul" û xwar lêdanê*

*Xwestin stûxwar bikin bilbil ji xwe re
Gote bilbil: "ez nabim kole ji we re*

*Birçî hişt xwe şewitand bû şehîd
Bilbil rabûn tev şiyar bûn, bûn egîd*

*Gihîştin hev dîtin gula çarperçe
Kirin qîrîn, kirin hewar bê feyde*

*Pêwîst e ew bigrin çek herin çiya
Da ku gulê derxî ji nav dest û piya*

*Kirine çek ji xwe re, ew tevr û bêr
Bûn hevsa ji wan re hemû proleter*

*Şêx û axa tev qeherîn tevde mirin
Qefla dijmin ji mejiyê xwe vekirin*

*Tev bûn wek hev, herkes gihîşt mafê xwe
Ew xebitîn ji bo welat û gelê xwe*

*Gelek xweş bû hemû welat digel Kurdistan
Xemilî bû wek bihişt hemû cîhan*

*Ax azad ka gula te, lê bigere bibîne
Bila kul û keder di dilê te de nemîne.*

Azad TEVBIRÎN

rewşenbîr û penaberî

MÎRHEM

Mirovê penaber, derketî û ne li welatê xwe, ne li ser ax û ava xwe, bi xetereke mazin re rûberû ye. Lewra ji kultur û dinyayeke din tê, bi rabûn û rûniştineke din mezin bûye, ber û dara civateke din e.

Li welatekî mîna Siwêdê xweparastin, li ser piyan mayîn û ya diwartir xwe bi pêşxistin, ne xercê herkesî ye û ji her ciwamêrî nayê.

Mirov nizane çî li bendeyî mirov e, piştî çend salên din dê biqewime.

Heger berî 12 ê Îlonê sala 1980 î serok û sekreterên niha rût û bê xwedî re mirov bigota hûn dê bazdin Siwêdê û hûn dê rojekê dev ji xebata şoreşgerî berdin û bibin patronên aşxanan, bê gûman dê hêrs bûbûna, herwiha dê tu gulebaran jî bikirana. Heger te ji gabetilî û îdeologê nizamî çî Pires re bigota tu rojekê ji Sitokholmê êrîşê bibî ser şoreşa Kurdistanê û tê bibî dijminekî sosyalîzmê û welatê xwe, teqez dê di bin simbêlan re bikeniya.

Gelo haya sekreter, şûrkêş û sermiyanên ha jê heye; dizanin ketine çî halî û çî anîne serê hevalbend û alîgirên xwe?

Gelo qet ji xwe dipirsin em ji ku hatin ku, me çî digot û xelkê ji me çî dixwest û li bendeyî çî bû?

Ya xerab ew e ku mêjiyê wan hewqasî li hev ketiye ku nema ji xwe pirsan jî dikin. Ji xwe êdî bi xwe re çî hesabî nabînin.

Penaberî mirovan deforme dike, ji mirovayetiya wan dadwerivîne û wan gêj dewixî dike. Piraniya penaber û siyasîyên me yê paş salên 80 î şewibîne û nema ji tiştî re dibin.

Penaberî û derketina ji welêt ne dost, belê dijmin e, dijminekî xapînok û henekpêkir e. Divê em penabertiyê baş binasin, lê hûr bibin û di derbarê penabertiyê de xwedî dikin (prensîb) bin. Serokê Partiya Karkerên Kurdistanê Abdullah Öcalan li ser penabertiyê vê dibêje:

"Du celeb penaberî hene: Penabertiyek heye ku bi bîr û hiş e, bi hesab û organîzekirî ye. Li vir penaber, li penabertiyê kêmanî û xeletî-

Penaberîya penaberên 12 ê Îlonê dikeve diwazde saliya xwe. Piştî derba diwazdehê Îlonê ya sala 1980 î hejmarek mezin ji zana, siyasî û xwendevanên welatê me derketin derveyî welat û yê "bijarete" hatin Siwêdê.

Di nav 12 salan de çî hate serê 'sekreter', 'pêşeng' û 'şervan'ên me. Ji gotinên Şivan ku ew bi xwe jî, ji daqurtandiyên penabertiyê ye "rûmeta sekreteran hate pênc penaberî."

Ne sekreteriya sekreterên me ma û ne jî kom û komikên li dora wan.

Çî hate serê wan, em ji Hûtê heftserî, ji penabertiyê bipirsîn. Belê, penaberî Hût e, Hûtekî heftserî ye. Di çîrokên Kurdî de hûtên wilo hene. Tu seriyekî jê dikî, berî tu bikî dido seriyê te jê kiriye dîsa bi reh dibê.

Penabertiya Ewrûpa û nemaze ya Siwêdê ji Hûtê heftserî jî hûtir e. Ne heft, belê 700 seriyên wî hene... Gelek ji van seriyên nexwiya ne,

her çav nikare wan bibîne, her dil hisa wan nake. Ji bo dîtin û hiskirinê çavên xweser, dil û guhên xweser û welatparêz divên.

Çavên mirovên welatên bindest qels in, şelbîfî ne, dilê wan ne xwîr e, ne zêde welathez û welatparêz e. Zû xwe ji bîra dike û xwe dişemirîne. Terka esil û dêzaya xwe, welat û axa xwe bi hêsanî dike, dipişve (asimîle dibe) û xwe li ber derbên hûtê penabertiyê nikare bigre.

Li dîroka giş penaber û derketiyên cîhanê, derketî û penaberên kurdan binêrin, giş ders û jêder in. Tije tirajedî ne.

Em Kurd mirovên welatekî bindest û parçekirî ne. Me di welatê xwe de tu carî negotiye xwezî bi îro. Dagîrker û zordaran em tim perçiqandine, zikê me rojek têr û deh roj birçî ye, me tim dar û kotek xwarîye, em hatine girtin û binçokirin. Li aliyekî xezaniya ekonomîkî û li aliyê din çavsofî û xwedênenasiya ziman, eşq û evîndariya welat li ba me birîndar kiriye.

yên xwe dinasin xwe didin hev, xwe nuh vedikin. Penaber xwe ji bo şereki mezintir û vegera welêt amade dikin. Ev celebê yekê ye. Penaberî û derketina celebê din rev e, bazdana ji welat û ji berpisiyariyê ye. Penaberên vî celebê xwe û mala xwe, xizim û mirovên xwe bi hevarî derdixin û dibin biyaniyên welatê xwe."

Penabertiya yekemîn serketinê, û ya diwemîn jî binketin, nizimbûn û wendabûnê tîne.

Penabertiya bê şûr, bê hiş, bê program û neorganîzekirî însan belav dike, ji hev dike û dadiqurtîne.

Tarîxa gurûb û siyasîyên me yê li derveyî welat bi xwe re gelek tiştên dersdar û fêrker hildigre. Ev tarîx girîng e, siyasî û rewşenbîrên me divê vê tarîxê baş zanibin, ders û tecrûban jê derxin.

Nizanim rewşenbîrên me li Siwêdê çiqasî serê xwe bi rewşa penaber û derketiyên me re têşîn, çiqasî li ser diponijîn û çendî pîrsa penabertiyê ciddî digrin. Em bi xwe, endam û dostên Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê -YRWK- bi rewşa derketiyên xwe pîr têşîn û çî gava em dibin temaşevanê rabûn û rûniştana wan, jiyân û felsefeya wan, sohbet û helwestê wan, giwişka dilê me digrin û heyfa me tê bi wan.

Gava em îro li jiyana penaberên xwe, ji roja derketinê û vir de mîna filmekî sînemayê di ber çavan re derbas bikin û derketiyên xwe li bêjîngê bixin, dê derkeve ku mîltanên me giş guherîne û bervaja bûne û tiştêk ji salên berî 80 î bi wan re nemaye. Giş betilîne, zerzilîne û bûne laş û derd. Tu dibêjî qey beqa reş bi wan de verişyaye û bi êşa zirav ketine. Di aliyê ruhî û zihnî de, wijdanî û îdeolojîkî de, siyasî û kulturî de gelekî li paş ketine, konzervatîv û bê xem bûne. Hin ji wan ji nuh ve bûne zarok, rojê çend caran li ser dê û bavên xwe digrîn, dev ji Kurd û Kurdistanê berdane.

Helbet li vir bi tenê sûc ne yê penaberî û derketinê ye, herwiha ne

Ewrûpa ye jî yê gunehkar. Sûcê mezin ê "rêberên siyasî" û kor, bê alternatîv û bê dezgeh e. Siwêd cih û warê rêberên kor û rêwindker e. Sekreter û sermiyanên jor giş li vir civiyane.

Piraniya wan dejenere bûne, bi nexweşiya gurûbên biçûk û çendkesî ketine. Bê tifaq in, hevdû negir in. Lîberal, ferdî û anarşîk bûne. Bê desgeh û bê prensîp in. Di wan de xweperestî û bêxîretî xwirt e, pozên dişewitin kê mî in, dilên ji bo welat lê didin kê mî in, guhên li ser welat û şoreşa welat in kê mî in. Dinya li Kurdistanê li hevkeve, rojê 100 heb bêne kuştin, ne xema wan e, avê di zikê xwe de naçelqînin, rehet û bêderd in. Di nav belawelayiyeke qaşo serbixwe de hin jiyana xwe dijîn, hin bi dikan û aşxanên xwe daketîne. Hin carna simsariya civîn û "konferansên" bê netîce dikin, yekîtiyên nuh çêdikin, çapxane û weşanxaneyên xeyalî dadimezrînin. Hin ji wan di hefteyekê de partiyekê çêdikin û yekê xera dikin, kovarekê derdixin û yekê digrin, bi teqsîtan siyasîyê dikin. Tiştêkî tam, bi rêk û pêk, saxlem û bi program nakin.

Siyaset û rewşenbîrî ne wiha ye. Nimûneyên wiha li tu derî tunin. Em nizanin ev civamêr li ku û kê ji xwe re dikin nimûne.

Sal diçin û tîn. Zeman derbas dibe. Gelê Kurd li Bakur dibe yek, serî hildide. Lehiya kovar û rojnameyên mîna Welat, Rewşen, Ülke, Gundemê û yê din dikeve rê, avahiyên mîna HEP ê çêdibin, Enstîtû û MKM çêdibin, bi dehan komîteyên mafê însanan, komîteyên piştgiriya zîndaniyan çêdibin, PKK dibe hereketêke gelfî, dibe malê milyonan û li cihekî mîna Almanya 60 hezar Kurd tîne ba hev, penaberê me li Siwêdê hêj di halê xwe de, hêj di nav pisîkolojiya salên berî 80 î de li PKK dinêre û terka êzingên xwe nake. Her dibêje êzingên min û xwe bi "yekîti" û navên vala re mijul dike, dijminayetiya PKK terk nake û bi çend quruşên Siwêdê qaşo ew jî karekî dike.

Bi parsê û çenqurûşên afîkariya Siwêdê aşê siyaseta şerê serxwebûnê nagere û çerxa cenga welatê me bi vî awayî nazivire. Bi parsê karên welatekî nayên kirin û bi parsê em naghêjin meram û mebestên xwe. Em hinekî li ser parsektiyê bisekinin.

Parsektî pîs e, qirêj û şexsiyetxwîr e. Ne layiqê mirovên siyasî û rewşenbîrên hez ji xwe kirî ye, şexsiyeta mirov dişkîne. Mirov nizim û biçûk dike.

Sekreter û "rêberên" me îro li Siwêdê bûne parsek û mîna hecheçikan devê wan ji hev e.

Em naxwazin bêne daqurtandin, em çîma xwe bi parsektiyê û tesfîmiyetê nayînin, felsefa me cihê ye. Em bi çavên din li dinyayê dinerîn û bi mêzîneke din diwezînin.

Em penabertiyê nas dikin. Em li himber derketin û dûraya ji welat ne bê çare û bê çek in. Em xwedî fikir û teorî ne. Em xwedî form û xwedî rê ne. Em piştî xwe didin şoreşa Kurdistanê, em dirêjayî û dewama gel û welatê xwe ne. Dilê me bi welat re ye, hişê me li ser welat e û ev tev jî li aliyekî em xwedî rêxistin in. Em di nav Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê de hatine ba hev, me hêzên xwe, kapasîte û şarezaiya xwe xistiye kanalekê. Em xwirt in, em xwegirtî ne. Ewrûpa êdî bi me nikare. Siwêd êdî dê bi me nikaribe. Em dê ji îmkânên Ewrûpa istifade bikin, bi hest û rûhekî Kurdistanîtir, bi tecrûbeyeke dewlemendtir vegevin nav gel û welatê xwe.

Berî her tiştî em divê tesîra gurûbên kevin û penabertiyê bişkînin. Lewra îro ji sedî 80-90 ê rewşenbîr û xebatkarên me yê fikrî ji nav gurûb û komikên berî salên 80 tîn.

Ji aliyê din rewşenbîrên Kurd li Siwêdê di nav gelê Kurd de nema-ze li Bakur ne xwedî cih û meqamekî baş in. Rewşenbîrên Siwêd di nav xelkê de pîrestîjîsîkestî ne.

Daxwaza aktûel ev e: Divê em hêzên xwe bicivînin, kom bikin û têxin ser hev. Bi vî awayî emê hem

berhemdartin bin û hem jî bi rûmetir. Wê gelê Kurd jî li me baştir xwedî derkeve, me mîna perçeyekî ji xwe bibîne û di nav dilê xwe de ji me re cihêkî çêke. Divê em bibin dil, mêjî, çav û rohnîdarên xelkê. Rewşenbîrên xelkê çî ji bo gel û welatê xwe kirine, çendî bi welat û gelê welatê xwe re bûne û çendî bi wezîfên xwe rabûne, em jî divê wilo û zêdetir jî bikin.

Em îro xwedî îmkan in. Îmkanên me ji hercar zêdetir in. Mîna me got em organîzekirî ne û di xizmeta me de rêxistineke hemdem Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê heye.

Şax û niwênerîtiyên (temsîlcilik) Yekîtiyê li piraniya welatên Ewropa hene. Yekîti, di aliyê kadro de, aliyê teknîkî û diravî de bûye hêzeke mezin.

Ji me nivîsandin, lêkolîn û analîzên ilmî, edebî têne xwestin.

Xelk ji me bi zimanê Kurdî kitêbên dersê, kitêbên ji bo xwendin û nivîsandinê dixwaze.

Rewşenbîr û entelektuelên welatê jî me wergerandinên li ser ilmê zîmên, soyolojî, pedagojî, dîrok û psîkolojiyê dixwazin.

Gelê me ji rewşenbîrên xwe xizmetê dixwaze. Prestîj û wezna rewşenbîran girêdayê xizmet û berhemdariya wan e.

Xizmet mirov qedirbillind û bi rûmet dike.

Xebata rewşenbîrî û fikrî, kareke ciddî ye. Karên ciddî jî bê rêxistin, bê yekîti û avahiyên mezin li Kurdistanê nameşin.

Berê me digot îmkan tune ne, xwendevan tune nin, bazar û sûka xwendinê çênebûye, em binivîsîn, em wergerîn wê kî çap bike û biweşîne.

Îro rewş cihê ye. Kovar û rojnameyên ku meqale û nivîsên me jî biweşînin hene. Xwendevanên zimanê Kurdî jî çêbûne û grafika xwendevanên zimanê Kurdî saet bi saet zêde dibe.

Rewşenbîrên me bila kerem bikin, meydan û gotin ya wan e.

SERVA ŞIYARÎ

*Kata şerî, dê kata şerî
Çiyayê Dare de Şiyarê min şehîd biyo
Xevera xayîne çitur Apî re berî*

*Ax kata şerî, beranê min
Rextê xo girêdî, vejî ve kowanê Kurdistanî
Eve hezar ajiya ciwaniye bidî mawanê Romî
Hona ke hêfê Şiyarê xo bijêrî*

*Kata şerî, dê kata şerî
Vanê Şiyar emso silxet amo Cizîra vêsaiyîye
Ez qurbanê bejna bariye, mal gawû verva ci berî
Reyna wuzaxê Kirmanciye biyo şen,
Çar hetê welatê Kurdistanî eve lînga gerîla bicerî*

*Kata şerî, dê kata şerî,
Mî xevera to hesna dormê min miz û dûman o
Şiyarê mî, dirvetanê xo ver mekuye
Mae to re bivo pepuga sanike
Heta axir dîna kowanê Kurdistanê şenû sero biwano
Beranê min, tu era xo ver mekuye
Dismenê Kirmanî çî xayîn o, çî bê îman o
Tesela mî kowanê Kurdistanê berzû ra qe nêkuna
Va Romê har verva qiyameta xo şero
Sola ci ra azo tern nêmano*

*Kata şerî, dê kata şerî, derd o, şêrê min derd o,
Kes iman nêkeno xevera Şiyarî,
Vanê wû şêro ve hot can o, axir heqê Kirmanî ci re comerd o
Wexto ke namê Şiyarê min vejîyo
Hevalû re biyo mizdanî, zerrê dismênî eve xof vila kerdo
Ala na qesas kî niya bimano, meşte qewxa ma wa
Eskerê Tirkî ma re xozo har o
Ey tîm goştê ma Kirmanû kal werdo
Jê şêrê Şiyarî kes eve camerdiye nêmerdo*

*Kata şerî, dê kata şerî
Xevera şae ci re berî
Şa gîredo koê Zêle
Binalo kertê Mazgêrî
Çekanê şêrê min biyarê serê koyê Jele de ronê
Va bibereqîyo verva Kurdistanê binenî
Tîja xo bido sarê Kirmanî,
Çî ke wû ma re şîren o zê azê hoteserî
Wûrzê ra hevalenê, şîme hêfê xo bijerîme
Pûkeleke vejîya, vore vaydîna
Va vengê ma bero Cizîra vêsaiyîye vayê desta soderî
Vazo kerdana Romî ci re nêmenda,
Eve kiştana Şiyarê şerî na qesas nêqedîyo
Kowanê Dêsim sero hûwena zaf ê mordemê ganêrî*

NIŞTIMANA XWE BINASE

ERZURUM

Erzurum li bakurê Kurdistanê, bi bajara Qersê û Artvînê re hemsînor e. Bilindahiya vê bajarê ji serpilka (sewiye) deryayê 1950 metro ye. Çiyayê herî bilind ê Erzurumê, çiyayê mescidê ye û

û berhemên çandî tev ji holê radikin.

Navê Erzurum ê kevintirîn Aze (Arze), Erze, Asê ye. Paşê Ermeniyên ve herêmê Kalhak an jî Karna, Bizansiyan Teodopolîs, Ereban Kafkala Tirkan jî

hatiye nûjen û çêkirin.

Li gelek deverên Erzurumê (Hesenqele, Ilica û hwd) germav hene.

Erzurum, herêmeke fireh e. Bi bajara Erzurumê ve girêdayê diwazdeh bajar -navçe- hene. Niştivanên -runiştvanên- navçeya Xorasan, Qereyazî, Xinûs, Tekman û Çatê tev Kurd in. Anku navçeyên Erzurumê yên başûr tev Kurd in. Li bajara Erzurumê û li hin navçeyên din Tirk û jî neteweyên din jî runiştvan hene.

Aboriya Erzurumê li ser çandî (zîraat) û sewalan (heywan) e. Di van salên dawî de li Erzurumê hin karxane hatine çêkirin. Lê kapasîteyên van karxanan ne zêde ne.

Li ser gelê ve herêmê tesîra ofî (din) û nijadperestîya Tirk gelek e. Kevneperestî û nijadperestîya Tirk li vê herêmê bi taybetî jî li Erzurum û navçeyên bakûr bi rêkxistî ye. Nêzikê deh hezar xwendekar, di zanîngeha Erzurumê de dixwînin. Paşverûtî di vê xwendegê de jî bi rêkxistî ye. Dewleta Tirk ya dagîrker, ji bo bişaftina gelê Kurd û propagandaya nijadperestîya xwe roleke mezin daye vê zanîngehê.



bilindahiya wî jî 3250 metro ye. Li gorî pêkolînên ku li Karaso, Tufanç, Pulur û hwd hatine kirin, didin nîşan ku dîroka avabûna vê bajarê berî zayînê hindiktirîn çar hezar sale. Cihgirtiyên (binkiyên) vê bajarê yên herî kevin Hûrî, Mîtanî, Sûbarî nin. Ev gelên ha jî, bab û kalên Kurdan bi xwe ne.

Ev herêm, di sedsala (b.z.) 19-13'an de perçeyek ji erdê dewleta Hayaşa-Azî (ku ev jî dewleteke Kurdî ye) bûye. Piştî ku ev dewlet hildiweşe ev herêm jî di nav sînorên dewleta Urartuyî de dimîne. Dema ku Împeratoriya Medî ava dibe, ev herêm di nav sînorên wê de dimîne. Piştî demeke dirêj dikeve nav sînorên Împeratoriya Persî û Makedoniyên. Ev herêm paşî dest diguherîne û di nav sînorên qiralîyeta Ermenî ya Artaksîad de cih digre. Ev herêm, bi dor demek di destê Romîyan de, paşî di destê Bizansiyan de dimîne. Arebên musulman, Sasanî û Mongolî gelek caran êrîşên artêşî tînin ser herêmê û li vir talan û qetîlamên mezin dikin. Nîrx

Erzen an jî, Erzî Rom (di wateya erdê Romî de) bi nav kirine.

Medreseya Cotminarê

Ev medres, di Çerxa Navîn de hatiye çêkirin. Li ser deriyê wê, motîvên ejderha û yên eylo (qertel) yan hene. Ev motîv jî, taybetiyên çanda Kurd-Arya ne.

Medreseya Yaqudiyê

Ev medres jî di deme Îslamîyê de hatiye çêkirin. Lê ev medrese bi motîvên çanda Kurdî hatine xemilandin. Li bajêr gelek qumbet (kûmbet) hene. Ji van qumbetan hinek bi motîvên Kurdî hatine xemilandin. Di nav van motîvan de eyloyên cotserî, boxe, ejderha, rehêle û kuffîk bala mîrov dikişînin. Di avakirina van qumbetan de bandora (tesîra) çanda Kurdî gelek mezin e. Ji bîrî van gumbetan li Erzurumê gelek mizgeft, hemam, xan û kaniyên kevnare hene. Keleha Erzurumê gelek caran

Lê digel vî qasî li vê herêmê di van salên dawî de gelek guherîn çêdibin. Piştî şerê çekdarî yê 15 ê Tebaxê li herêmê bîr û bawerîya netewî di nav gel de pêşve çû. Livbaziyan gerîla yên li vê herêmê her diçe xurtir dibe. Û gel li gerîlayên xwe, xwedî derdikeve. Tirsê dagîrkerîya Tirk a li ser gel hêdî hêdî dişikê û gel xwe ji qeyd û bendên koletiyê azad dike. Gelê herêmê yê Kurd, bi taybetî jî, yê li başûrê Erzurumê bê tirs di nav serhildanan de cî digire, di bin pêşengîya gerîlayên xwe de ber bi serxwebûn û azadiya xwe ve dimeşe.

ZAROKÊN ŞOREŞÊ

Medenî AYHAN

Ez li ser xetê (sînorê) bûm. Min li der û dorê bajêr mêze dikir. Li ser xetê, li aliyê çepê, du zarok rûniştî bûn. Emrê (temenê) wan sêzde-çar-de salî bû. Li ber hev rûniştî bûn û qise dikirin.

Zeyd:

- Em li malê bi Kurdî qise dikin. Li dibistanê bi Tirkî. Lê zarokên mamosteyên me, li malê jî li dibistanê jî, bi Tirkî qise dikin. Yek jî bi Kurdî nizanin. Em jî tev bi Kurdî qise dikin û em bi Tirkî nizanin. Lê em di dibistanê de bi zimanê Tirkî dixwînin. Ge-lo em çima bi zimanê xwe naxwînin?

Murat:

-Bi zimanê me nivîsandin û xwendin çênabe.

Zeyd:

-Çawa çênabe? Min di destê bavê xwe de rojnameyê Kurdî dît. Bavê min zor dixwend. Min lê nêrî. Lê min tiştek jê fam nekir.

Murat:

-Mamoste ne ji welatê me ne. Bi Kurdî nizanin. Ji ber vê yekê bi Tirkî me hîne xwendinê dikin.

Zeyd:

-Gelek mamosteyên me hene ku bi Kurdî dizanin. Ma xalê min Kurdî nizanê?

Murat:

-Lawo midûr nahêle.

Zeyd:

-Midûr jî, ji gundê me ye û Kur-manc e. Çima nehêle?

Murat:

-Ez nizamim lawo, ka tu bêje çima?

Zeyd:

-Leşkerên dagîrkeran nahêlin. Dibêjin Kurdî tune, welatê Kurdan tune. Li Sûriyê pismamên me hene, ew jî bi Erebfî dixwînin û dinivîsin.

Murat:

-Ma tu çûyî Qamişlo?

Zeyd:

-Erê, pismamên me jî carina

tên, lê peyvên me ne wekhev in.

Murat:

-Erebî ketiye nav zimanê wan, xwendin û nivîsandina wan bi Erebfî ye. Televîzyon û radyoya wan jî, bi Erebfî ne. Kurdiya wan xerab bûye.

Zeyd:

-Ya me jî, Tirkî ketiye navê çend roj berê bavê min û pêşmergeyêkî revoker qise dikirin. Digtin li Îraqê Erebfî li Îrane jî Farisî dikeve nav zimanê Kurdî.

Murat:

-Tu jî ji ber xwe de çêdikî.

Zeyd:

-Bi navê Xwedê ez derewan nakim. Li Îranê û Îragê û Sûriyê navê gund û bajaran jî guhertine. Li vir jî welê ye. Ka navê gundê te çî ye? Çima dî navên gundê me hene?

Murat:

-Erê lawo, ma li Îranê Kurd hene.

Zeyd:

-Li Rusyayê jî hene. Di sala 1639'de Tirk û Farisan welatê me di navbera xwe de perçe kirin. Welatê me di sala 1923'an de, di navbera Franse, İngiltere, Tirk û Farisan de careke din hat parve kirin. Anku dewletên dagîrker û emperyalîst bi hev re welatê me perçe kirin.

Murat:

-Dagîrker û emperyalîst çî ye?

Zeyd:

-Dewletên ku welat û gelên bindest diparçeqînin û talan dikin, ji wan re tê gotin.

Murat:

-Bevê te ne tenê mele ye, lê ew pirofesor e jî lawo.

Zeyd:

-Bavê min mele ye, lê ew hinek dîrok xwendiyê.

Murat:

-Ma dîroka Kurdan jî heye?

Zeyd:

-Çawa tune, ezê pirtûkek bidim te; di pirtûkê de behsa bindestî û serhildanan tê kirin. Bavê min wê rojê ji me re dixwend.

Murat:

-Kurê apê min jî, par behsa tiştên wilo dikir. Ew û kalkê min ketin qirika hev. Kurê apê min dabaşa rizgariyê dikir.

Zeyd:

-Kurê apê te kî ye?

Murat:

-Defîl, navê wî defîl e. Defîl derketiye çiyê. Niha bi çek digere. Bi rastî kalikê min jê xweş nebû. Lê niha pê serfiraz e.

Zeyd:

-Divê ku mirov xwe bi xwe mezin bike. Divê mirov zanibe ji bo çî derdikeve çiyê.

Murat:

-Ka birayê te ji bo çî çû?

Zeyd:

-Ji bo evîn, bîr û baweriya welat, ji bo rizgariya gel û welat çû. Mirovê ku ji welatê xwe hez neke, ji tu tiştekî hez nake. Ji bo welatêkî serbixwe û yekbûyî bila hemû tişt feda be.

Murat:

-Te xeberdanê birayê xwe ji ber kiriyê.

Zeyd:

-Erê. Ezê riya wî bajom. Roja ku destê min baş çek bigre, ezê herim.

Murat:

-Tu dikarî herî? Tu dê ji bo çî herî?

Zeyd:

-Gelek kurê bavan ên wek me çûn. Ji bo navê gundan û bajaran, ji bo navê welat em hîfnin û deynin. Ji bo gel ji bindestiyê xelas be û hemû tişt azad be. Ji bo ku mirov bi çavekî mezin li xwe binêre, li himber nebaşiyê... Ka, ma tu jî her dem nabêjî:

-Navê te hatiye dizîn, navê te ne bi Kurdî ye.

Murat:

- Murat ne bi Kurdî ye?

Zeyd:

-Ne bi Kurdî ye. Navê mezinekî

Osmanî ye, Murat peyveke Erebfî ye. Lê tişt nabe, navê min jî ne bi Kurdî ye.

Murat:

–Çima bi çî ye?

Zeyd:

–Bi Erebfî ye. Ma Zeyd ne kole-yê Muhemmed bû?

Murat:

–Bavê te çima navê koleyekî li te kiriye?

Zeyd:

–Ji ber ku misilmanî û koletî ji me ne dûr bû.

Murat:

–Em niha kole ne.

Zeyd:

–Ne wek berê. Berê em li himber hev mêr bûn. Niha em li himber dijmin şêr in. Li çiyar şervanên şoreşê hene. Li bajar û gundan dê--bav, kal-xort, keç, mezin û biçûk tev li hemberî dijmin di serhildanan de cih digirin. Singa xwe didin ber guleyên dijmin.

Murat:

–Wê rojê, dikandaran dikanên xwe girtin. Gelek mirov bi hev re çûn ser goristanê, şervanekî şoreşê şehîd bû bû, dayika şervanê şehîd li pêşiya mirovan stran digot. Berê ku mirovek dihat kuştin, digriyan.

Zeyd:

–Ev şerê şoreşê ye. Dem ziviriye. Gel êdî koletî qebûl nake. Jiyan roj bi roj rûmetir dibe.

Murat:

–Em wek cerdevanan (quriciyan) ne bê namûs in.

Zeyd:

–Mirina di nav ciyan de jî, mirineke bi rûmet nîne. Ji bo namûsê, xebat lazim e.

Murat:

–(Baweriya xwe bi Zeyd anî, destê xwe avêt ser milê wî û got) Rast e, di vê riyê de em tev bi hev re bin, hemû tişt ji bo azadiyê...

Zeyd:

–Em ji îro pê ve zarokên şoreşê ne.

Her du bi hev re destê wan li ser milê hev, rabûn ser piyan û bi rê ketin çûn...

SERXWEBÛN

Rêzan DILOCAN

çî ewrekî reş û tarî
gule w bimbe jê dibarî,
gî panzer û tang û topan,
hêzê reş û hov û harî.

êrîş dikin bi hezera,
têne ser me bi teyara,
konevan û van barbara,
dijînin tim bi kedxwarî.

gerîla jêr xof û tirs e,
bo dijmin bi kî û hirs e,
êdî hesab jê dipirse,
radkej holê vî xedarî.

xortên jîr û keçên zana,
li serê çiya w li zîndana,
navê Kurd anîn zimana,
qetandin qeydê zingarî.

bi cehd û xebat û bê westî,
wî derînim bi vî destî,
çî dijîminkî sit w şikestî,
hezar nelet lê bibarî.

çiya bi xwînê xemilî,
kevir û ber dar û gulfî,
welat evîna vî dilî,
bibim gorî hezar carî.

xortê bê mal keça delal,
tvinga xwe ji xwer kir heval,
dirîjînin xwîna zelal,
gel ji wan tim hêvîdarî.

enî w Partî û artêş in,
gund û bajar xweş û geş in,
bo serxwebûn tev dimeşin,
dibên: "Bimrî koledarî!"

bin zîlm û zora sed salan,
pêkolî w lêdan û talan,
rakim heyfa bav û kalan,
dijmin hema bi me karî.

belav dibin li deşt û zozan,
li Amed, Botan û Xerzan,
wek stêrkên nava ezman,
rohnî didin reş û tarî.

li Dersim û li Mêrdînê,
li Erûh, Şirnex, Nisêbînê,
Serhed hat avdan bi xwînê,
milê xwe dan bin vî barî.

Gebar û Mûnzûr û Sîpan,
Cûdî w Herekol û Zilan,
girêdan govend û dîlan,
Bagok, Agirî w Hekarî.

havîn, payîz û zivistan,
tevd şîr dibin bax û bîstan,
hatî bihara KURDÎSTAN,
bi cehd û şer û xebatkarî.

rîhan û sosin û beybûn,
gul û nêrgiz li me derbûn,
derdor kesk û sor û zer bûn,
çar-hawîrdor wek biharî.

di zindan da bi berxwedan,
li serê çiyar serî hildan,
bi Newroz û cejna Kurdan,
anîn mirna vî kedxwarî.

pasa û hîre lajî

Vatoxe: SIMAYLIZE

Arekerdox: WUSXAN

Welatê de pasayek beno, hîre lazê xwe benê. Rozê, pasa vengda lazanê xwe dano, ci re weşiya xwe keno, vano:

–Bikênê, roze yena ez ginen pro miren. Waxto ke ez merd, na koê serê ma ro meşerê..."

Emrê heqî yeno, pasa gineno pro mireno. Lazê pasay anê verê sarayiyê de hîre hêrigan nanê ro. Lazê pîlî re beno derd, vano:

–Lawo, ala ez na koyî ser de şerîne. Ala çik serê na koyî de esto? Na piyê ma çae niya va?

Kûno ra raê sono, zaf ke sono, senik ke sono, rastê mordemekî yeno. Pers keno, vano:

–Şuwane cena?

Mêrik vano:

–Ya, cen. Hema şertê mi estê. Heke şertanê mi qewûl kena, mi de bê.

Lazê pasay vano:

–Şertê tu çik ê, ala mi ra vase.

Mêrik vano:

–Şertê min o vere: citê gawû fin ra tu ver. Tajiya mi ke kotî kote ro, tu gerek e wûza biramê. Şertê min o diyîn, cariya mi tu re nan û most ana, nan bûre, gil mesikne; most bûre ame mesikne. Şertê min o peye: meqariye! Kam ke qariya, mane ey ra çerme vezeme, qewul kena?

Lazê pasay vano:

–Qewul ken.

Kuno ra mêrikî, sone çe mêrik. Mêrik soder wurzeno ra, cite gawû

fino ra lazê pasay ver, vano:

–Tajiya mi ke kotî kote ra, wuza birame.

Lazê pasay wurzeno ra, gawû fino ra xo ver, kuno ra tajiye ver, tajiye sona kemere ra kuna ro. Lazê pasay bese nêkeno biramo. Şiya darê de nîseno ro, cariya mêrikî ci re nan û most ana. Lazê pasay gilê nanî sikneno. Amê mostî kî sikneno, xo keno mird. Sonde gawû ceno yeno çe, mêrik cira perskeno, vano:

–Tu qariya?

Lazê pasay vano:

–Çi meqarîne... Hen qarîne ke bîne letey!

Mêrik çerme miyanê ney ra vezeno, lazê pasay kîseno. Hêriga lazê pasay permelîna ro, nafa kî birayê wertî vano:

–Ala ez şerîne, na birayê ma xeyle waxt o şiyoy. Towa ci ra xeve-re nêvejiye. Hêriga dey kî ha wa permeliye ro.

Wurzeno ra, koyî ser de sono. Zaf ke sono, senik ke sono, raste mêrikî yeno. Vano:

–Şuwane cena?

Mordemek vano:

–Ya cen. Hema şertê mi este. Heke şertanê mi qewul kena, mi de bê.

Lazê pasay vano:

–Qewul ken.

Mêrik de sono çe mêrik. Mêrik vano:

–Şertê min o vire: citê gawû fin ra tu ver. Tajiya mi ke kotî kote ro, tu gerek e wuza biramê. Şertê min o diyîn: cariya mi tu re nan û most ana. Nan bûre gil mesikne, most bûre ame mesikne. Şertê min o peye: meqariye! Kam ke qariya, çermê miyanê dey ra vezeme.

Lazê pasay qewul keno. Soder wurzenê ra. Mêrik citê gawû fino ra ver, tajiye kî verdano ra. Lazê pasay gawû ceno, kuno ra tajiye ver sono. Tajiye sona gilê kemerî ra kuna ra. Lazê pasay bese nêkeno biramo. Cariya ci re nan û most ana. Lazê pasay nan weno gil sikneno, most weno ame sikneno. Sonde gawû ceno yeno çe. Mêrik vano:

–Tu qariya?

Lazê pasay vano:

–Qarine ke se vajîne!

Mordemek çermê miyane ney ra vezeno, ney kî kîseno. Hêriga lazê wertî kî permelîna ro. Birawo qiz niyadano ke hêriga birayê wertî permeliye ro. Kûno ra rae. Koy ser de sono. Zaf ke sono senik ke sono, rastê mordemê yeno, mordemî ra vano:

–Şuwane cena?

Mordemek vano:

–Şertê mi estê. Heke şertanê mi qewul kena, mi de bê.

Lazê pasay vano:

–Şertanê tu qewul ken.

Mordemek şertê xo birayê qijî ra kî vano. Piya sonê çe. Soder mêrik

citê gawû fino ra lazê pasay ver. Tajije verdano ra, lazê pasay gawû fino ra xo ver. Kûno ra tajiye dima. Tajije sona gilê kemere ra kuna ro. Lazek şiya dare de linge erzeno linge ser, kuno ra. Niyadano ke cariya mêrikî nan û most ard. Nanê xo weno. Pê cariyê kî kay keno. Gawû kemer ro erzeno. Kilame û nîre sik- neno. Sonde darîno we, yeno çe. Mordemek vano:

-Tu qariya?

Lazek vano:

-Nê, nêqarine.

Mordemek cîniya xo ra dijdiya vano: 'sonde wurze, tene nu bipoze. Ma ney caverdîme şîme'.

Lazek peyê wondolî de gosdano. Cînike nanê tewa pozena, bena kena sandiqe. Lazek kî sono kuno sandiqe. Sero kîlit kenê. Verva soder kune ra raê sonê. Zaf ke sonê, senik ke sonê, rastê dewe yenê. Kutik cenê nîne ra. Mêrik vao:

-Ax, nika wû şuwane ma tika biyenê, ma na kûtkan ra bixelesnenê.

Aê de lazek vano:

-Ez o zerê sandiqe de ne!

Mordemek lazekî sandiqe ra vezeno. Lazek kutkan her jû nano ra caê. Hîremena kune ra raê sone. Rastê pirdê yenê. Pird sero kune ra, mêrik cîniya xo ra vano:

-Ma gerek e sonde ney berjime awe.

Lazek hayîg beno, hesneno. Mêrik û cîniya xo ra piya kune ra. Lazek kî teyna kuno ra.

Sonde-lete sono mêrikî erzeno kose. Kûno viraya cînike. Verva soder cînike vana:

-Wurze ma lazekî berjime awe.

Nêzona ke lazek caê xo vurno. Wurzenê ra. Sare de cînike cena, lingu de lazek ceno. Mêrikî erzenê awe. Soder cînike wurzena ra ke viraê de lazek o. Vana:

-Mêrdê mi kuyo?

Lazek vano:

-Ma tu sonde va ke "wurze berjime awe", ma kî guret eşt awe.

Cîniya mêrikî ceno. Hêfe birayane xo kî ceno. Sono reseno mirode xo.

KILAMÊ

Çemê Sey Momudan

sonde, sonde, sonde,
hewnê mordemî wes yeno
filanunê Sey Momudan de,
çemê Sey Momudan o,

bira Hemed na gavan o,
amûne ke şêrî dewe,
pepûg mi re biwano,
vazê çi şîn o, çi şivan o,
tê de miz o, duman o.

çemê Sey Momudan de
bira na hênî yo,
pîro çi kota ra mi dima?
mal û gaê to mi ver niyê,
çiralix o ke mi do to,
çiralixê raa haq yo,

çemê Sey Momudan o,
bira na Kemara Bel a,
vano pîro eskêr me ser meya,
meke, werte ma mezel o,
ma name ve jumîn ra,
ax jumîn dame wele,
yê ma pîr û tolivenî ya,
meke werte ma mezel o.

çemê sey Momudan o,
bira miz o, duman o,
vakê ponc teney ginay,
lazê biraê to Wuşenî,
çutir pêra maneno, dismen şer
keno,

jê morê polatî şiv dano.
çeme Sey Momudan o,
bira bira hûrdî yo,
vano makîna bîje ver veze,
meterse, tolde vinde, biceriyoy,
vano pîro tifongê mi,
neferûnê dewlete mede
to re çuyê haq yo.

çemê Sey Momudan o,
bira Hemed na gavan o,
wondêr tever nêkeno,
tifongê Kirmancî yo,
lawo Xidir tevera mene,
cîsnê pîr û rayverê tu yo,
vano ponc teney ginay mi ro,
honde belî nêkeno,
juye gina buriya mi,
gonî kota çime mi,
pîr û rayver belî niyo.

DÊSIMÎ

Arekerdox : Mesut ÖZCAN

Hewa Sayîni

haq adir ve Avdila pasay verdo,
kote qerezê mordemê pîlî,
Sayîn vano qedrê cane xo bizone,
ma sero cerena qenuna kafîrî,
ax de biye, biye,
na eve ma biye,
Sayîne mi qoledê xo gureto,
şiyoy baskina helaiye,
vano tersa mi sarê mi tolde kuyo,
kowunê Dersim de nêmano çena û
ceniye,
ax kora merdiye.

esker na wo amo,
koê Dersim muniyo,
Sayîn vano di sarêy vênay mi ra,
ju yê xanim o, ju yê Afîşer efendi yo,
Sayîno mi qoledê xo gureto,
şiyoy destê koê Munzurî,
vano lao bêbêxtenî mekere,
ma piya werdo qirvanê Xizirî,
aşîr merdena mi re qayîl nêbene...

Xozatî perskena,
Qerelan ra nat o,
Qanunê Mustafa Kemal pers kena,
çi çiyode bervat o,
Sayîn vano tornê pîr Seyda meso,
min û to cizikê ju mae lito,
Haqo ti kêş ser de niyare niyanene,
biray berdo sarê biray çadire de roto,
Sayîne mi re efkar mevo,
Hesenî hêfê to gureto,
ax de biye, biye,
na eve ma biye,
Sayîne mi ke merdo nêmerdo,
şikiyo tilsimê Kirmanciye,
pane pane, Sayîne mi pane,
eskerê Kemal pasay amo,
ma qirkeno
mezal ci mede
pane.

Farisiya navîn ji Farisiya kevin hatiye himatê. Ev di dema Emperetoriya Sasanî de bi kar dihat, pê re jî di navbera sedsala III'an û X'an ê Zayînî de bi kar hat. Helbet, zimanên din ên Îranî jî bi kar dihatin, di destpêkê de zimanê Parthî bû. Zimanên fireh ên li Bakurê-Rojhilat jî wekî Sogdonî di

wê demê de xweş bûn. Gelek gotin û wêjeyên Farisiya Navîn li ser zimanê Sogdonî çêbûne. Herwekî Farisiya Navîn zimanê fermîyê Emperetoriyê bû, xwedî bext derket û ni-

derbasî nav tevahiya nivîsarên Farisiya Navîn bûye, piraniya van nivîsaran olî ne û pexşane ne. Wêjeya ku jê re dibêjin "Pehlewî" di demên cuda de hatine nivîsandin, du sistemên Aramî tevîhev bûne. Perek ji nivîsarên "Pehlewî" pir dereng hatine, bermaya wêjeyê devkî ya fireh e, mêtûya wê digihêje dema berî Sasa-

ji Zendê girtine, serçavkên Grêkan ên bi zimanê Sîryakî, serçavkên Hîndî yê wergerandinî, pirtûkên stêrnasî yê Babilyonî ji van in. Ev şadetiyeke mezin a zanistî nişan di-de ku ew çalakiyên ku di dema Şaporê I. û Kosroyês (Chosroês) de hatine kirin; zanyarên Îslamî gelkî fê-de jê wergirtin.

Ev nivîsarên han bi xwe bûn sedemên ku Zerdeştî **Avista** binivîsandin, nivîsarên Îslamî û bergîriya ola Zerdeştî jî li dijî firehbûna Musulmantiyê li Îranê bêtir hîştin ku di sedsala XII'an û

wêje bi farisiya navîn

vîsandin bi wê hate kirin. Çend stûnên ku bi Farisiya Navîn li

ser hatine nivîsandin hatine parastin. Peyva "Pehlewî" ji zimanê van nivîsandinan re tê gotin, nivîskarên Farisan ew bi kar anîne; anku, piştî hatina Musulmantiyê. Mebesta nivîskaran jî vê peyvê ev e: ziman û wêjeya lehengên (Pehlewan) kevin, anku Parthan, mîletê Îranî yê ku ji Bakurê-Rojhilat derketî, dîroka wî mîletî (di navbera ~250 û 224 de) yek ji kevintirîn dîroka Îranê ye. Ji van Parthan gelek dengbêj, stranbêj û mûzîkvan derketin, li eywanên mîrên xwe distran. Bi saya van dengbêjan tradîsiyonên Îranî gihîştine me. Dengbêjan, berhemên nivîskî li şûna xwe nehîştin. Vêca, peyva Pehlewî jî vê wêjeya devkî ku hevnanên wê honrawa stranbêjî û destanî ne re tê gotin. Ew wêjeya hanê

niyan. Dibe ku redaksiyona **Avista** li destpêka vê demê, bi tîpên "Pehlewî" be. Emê li ser nivîsarên Farisiya Navîn ku çavikên wê Parthî ne bi axivin. Lê, li aliyê din, nivîsarên "Pehlewî" tê de naverokin hene. Ev jî, bi taybetî yê macên (niwenêr) Zerdeştî û yê zanayên eywanan in. Nivîsara yekê ji wan ku em heval didin, wergerandina **Avista** ya bi Farisiya Navîn e: Perçên serekîn tenê ji vî berhemî ku wergerîne Pehlewî hatine parastin; ev deqine (nushê) bi Pehlewî jî hatine ravekirin, jê re dibêjin **Zend** (zanin, ravekirin) an tefsîr bi Farisiya Navîn. Macên Zerdeşt deqên **Zend û Avista** ji ber dikirin. Herwekî destnivîsên **Zend û Avista** kêr dihatin dîtin. Gelek pirtûkên zanistî yê wê demê, pir tişt

Pierre LECOQ

IX'an de wêjeyê ke olî ya fireh a Zerdeştî xweş bibe. Xweşkiri-

na **Avista** bi vî awayî bû: Li gor girekiyan, gelek deq ji **Avista** hatine girtin. Ev deqin wergerîne Farisiya Navîn, paşê bi ser ve zêde bûn û bûn wekî pirtûkan. Ji van pirtûkan diwanzdeh heb gihîştine me. Hin jê dirûvên xwe ravekirin û çespendina olî ne, hin jê li ser çîrok û bûyêrên dîrokî ne.

Bundahişn, an **Pirtûka Afirandinê**, bi xwe deq in, di navbera sedsala VII'an û IX'an de, ji aliyê redaktorê ve hatine nivîsandin. Em du rengên tradîsiyonên destnivîsî yê ji wan nas dikin. Agahdariyên pirtûkê, ji nasîna fireh a zanîna kevin a Îran hatine, giranbahiya wê bi taybetî ji kevintiya agahdariyan hatiye, nemaze beşê li ser zanîna erd û ezmên. Wekî çawa Mary Joyce ni-

şan dide, em jî mat dimînin ku çawa dûrbûnek heye di navbera bîr-baweriyên dogmatîk ên pirtûkê û bîr-baweriyên zanistî yên pêşketî ku bi serbestiyeke fireh di pirtûka bînav a navdar de, bi zimanê Farisî, **Sersînôrên dinyayê**, di eynî demê de hatine. **Bundahişn** wekî pirtûkeke dîrokê jî tê hesibîn. **Şahname** ku di dema Sasaniyan de bi Farisiya Navîn hatî nivîsandin, xuya dike ku nivîskarên çarçewa Zerdeştî ya şeş hezar sal ji wesfa dîrokî ya vê çapê girtine, û tradîsiyona Zerdeştî bi ser ve zêde kirine.

Dênkert an pirtûka bendên olê, ew jî komek ji deqan, ji pir pirtûkan li hev hatiye, em tenê herdu redaktorên dawînin dinasin: du macên mezin Fars in, di sedsala IX'an X'an de **Zendeka çêtir** armanca wê ku Zerdeştîyan şiyar bike, da ku bi rengên xweşik bi musulmantiyê neyên xapandin. Îca, pirtûk bêtir di vî warê cudatiya Zerdeştîyê û Musulmantiyê de daxive.

Dênkert deh pirtûk in, herduyên pêşîn û ya dehê wenda bûne; destpêka pirtûka sêwemîn hatiye dirandin. Pirtûka III, IV û V'ar: çîrok û bûyerên dîrokî dinirîne, bi taybetî nîşan dide ku Zerdeştîyê û hişê sirûştî tevîhev dibin. Pirtûka VI'an berhevokek ji qewîtîyên sinçî ye. Ev jî nîşan dide ka çawa Zerdeştî bihayên xwe yên sinçî bi kar tanîn. Ev pirtûk navika pirtûkên pêşîn û hersiyên paşîn e.

Ev hersiyên paşîn ku di destê me de ne li ser xalên rexnegirî yên olê ne; nivîskarê pirtûkê xwestiye ku bala bawermendan ji tiştên girîng bikêşîne. Pirtûka VII'an li ser Zerdeştî bi xwe ye. Pirtûka VIII'an kurtiya 21 nesken ku **Avista** jê çê dibe ye, **Avista** ku di dema Sasaniyan de hatî nivîsandin. Pirtûka IX'an berhevokek e ku ji sê ravekirinên **Gat-ha** tê pê.

Bê guman, **Dênkert** ji "tradîsiyoneke fêrkirî" (gotin a Menasce e) hatiye pê: nivîskar tê de wekî "hilgirên" **Rastiyên Xwedê** ne, mirov ji pexşa-

netiya nivîsarên wan de zane. Bê guman, pirtûk neynika metodeke dibistanî ya Zerdeştî ya ku ji mêj ve, berî Îslamê hebû ye.

Ji bilî van komepirtûkan, zincîrek ji pirtûkên olî bi zimanê Pehlewî ku berî Îslamê hatine nivîsandin jî hene. Macekî Zerdeştî, navê wî **Zadsprem**, di sedsala IX'an, pirtûkek ku sernivîsa wê "Daxwaz" e, ji deqên **Avista** û **Zendê** da hev, çend mijarên serekîn ên doktrînî tê de bi cî kirin. Berhevokek din a **Mazdî** jî, ji sedsala X'an de heye, sernivîsa wê **Rivayet** e, nivîskarê wê nenas e; êmêd jî pirtûkek bi sernivîsa **Rivayet** li ser gelsên konkret û rewa û li ser adetan di sala 955'an de li pey xwe hiştiye. **Dîsa Zadsprem** ji birayê xwe, **Macê mezin Manuşçîhr** (nivîskarê 92 Hukmên olî), hin name girtine, ew jî li ba me ne, tê de bala birayê xwe dikişîne li ser paqijkirinê û di sala 632'an de hatiye nivîsandin.

Pirtûka Gûmansîkên bergîriya Zerdeştîyê dike, di sedsala IX'an de, ji aliyê **Merdenferrûx** de hatiye nivîsandin. Pirtûka ji tevan navdartin, **Pirtûka Wirazê Dadmend** e, dabaşa tiştên ezmanî û dojhê (cehenemê) dike. Pirtûk bi xwe wekî **komêdiyeke xwedayî** ye: ravekirina **Yeştekê** li ser temenên ademîzadiyê hên maye, **Pirtûka Camasp** qala perîşaniya dema dawîya dinyayê dike.

Çi pirtûkên ku me li jor bi kurtî jmartine, têrê dikin ku mirov mercên neteweyên Zerdeştî binasin, neteweyên ku ji aliyê musulmanan ve hatine êrîş kirin û li her derî hatî belav kirin.

Gava kartêkirina wêjeya Erebi û ya Farisî li ser çî dibe dûrvên wê yên **Mazdî** jê tene rûçiqandin. Wergerên yekemîn ku li ser xeberîna bi dilekî germ û zanistî hatine ber û xwestine vê kelepûrê biparêzin.

Bi zimanê "Pehlewî", zincîrek ji berhevokên qewîtîyan (**Enderz**) ên bi zanîneke pratîkî jê mane. Ew zincîr bermaya wêjeyêke biçûk a zen-

gîn e, tê de mirov qedera dawîhati-na Sasaniyan dibîne. Gelek **enderz** derbasî nivîsarên Erebi û Farisî bûne. Bi taybetî, ji **Şahname** bi zimanê "Pehlewî" tenê **Berhevoka Horawî** ya **Eredeşêr** maye. Gelek pirtûkên biyanî ku wergerînên "Pehlewî" ne, wekî **Kefile** û **Dimnê** wenda bûne. **Dawî**, bi "Pehlewî" di warê qanûnên şarî de, **Pirtûka Hezar Pend**, maye; çend kurtepirtûkên fêrkirinê mîna **Qanûnê Lîska Şeş-rengê**, û du ferhengçeyên sûdmend ku bi derengî hatine nivîsandin, mane.

Farisiya Navîn û çend zimanên din ên Îranî bûne zimanine navgîn ji wêjeyên olî yên ne Zerdeştî re. Di destpêka vî sedsalî de, li korta **Tûrfanê** (Tirkistana Çînî), hin perçeyên ji destnivîsa **Manîkî** ku pir paqij û ronak in, bi zimanê **Parthî**, bi Farisiya Navîn, bi **Sogdî**, bi zimanê cîgehî, bi **Balxî** û heta bi Farisî jî çêkirine, hatine dîtin. Ev perçeyên **Manûkî** bi giştî sirûd in, li gor naveroka wan ji hev hatine parvekirin, li ser awayên sirûdên **Avista** hatine nivîsandin. **Mirov** tê de wergerandina **Kenon** (Canon), bi zimanî **Aramî**, hin nivîsar ji **Şabuhregan a Manî** û çend perçe ku ji aliyê şagirtên wî de hatine nivîsandin, dibîne. **Manî** rîya ola xwe pêşkêşî **Şapûrê Yekemîn** (241-272) dike.

Sogdî, roleke gelek gewre û bazîrganî bi Çînê re, bi dirêjahiya hezarsalî ta dema hêrîşên Mongolan, list. Bi **Sogdî**, hin perçe ji destnivîsên **Bozî** û **Fileyî**, hatine dîtin. Perçeyên yekemîn ên ku hatine dîtin, wergerandinên ji **Sanskrit** û **Çînî** ne. Ji bilî nivîsarên li ser olê, nivîsarên li ser stêrnasî û bijîşkiyê jî, çîrokên li ser şerên **Rustem** û **dêwan** ku **Firdewsî** nas nedikirin, tê de tene dîtin. **Dêra Fileyî** ya **Nestorî** hin mirîdên xwe li nav **Sogdiyan** çê kiri bûn. Gelek perçe ji wêjeya **Fileyî** ya kevin hene: **Bendên Pierre**, **Bendên canemergan** (şehîd), **xwendinên olî**, perçên ji "Evagre le Pontique" û heta rûpelek li ser **dêra Sogdî**.

Civata Kurd di pêvajûya tekoşîna azadiyê de dijî. Ji bo kesaniyek û civateke azad, di welatê xwe de têdikoşe. Ev tekoşîn di gişt qadên jiyandî de didome. Kesaniyeke azad bi ponijandineke azad dafire û avadibe. Ponijandina azad bi zanyariya felsefî û bi zimanê mader geş dibe, zexim dibe û digihêje qonaxeke bilind. Mixabin civata Kurd di warê

ZIMAN Û BÎRDOZÎ

Şemsettin RONAHI

ponijandina bi zimanê mader de, di qonaxeke baş de nîne. Divê di vî warî de jî, xebateke qenc, bi jîrekî bê kirin. Bi raya min pêwîst e ku zimanzan û yên ku haya wan ji felsefê heye, li şer vê pirsê rawestin. Pêwendiyên bi hev re deynin û rîya xebatê ya bi hev re bibînin. Bi vî awayî, dê bingeha sazgehekê bê avêtin.

Em divên ku li ser van pirsan û di vê mijarê de nivîsarên xwe bidomînin. Di vê destpêkê de, dê kêmasiyên me hebin. Ponişin û ramandin li ser pirsên felsefî bi zimanê mader ji bo me ne tiştêkî hêsan e. Kevneşopiyeye me welê nîne. Heya niha em bi zimanê biyanî li ser vê pirsê sekinîne. Têgihên felsefî ku em zanin û fêr bûne, gişk bi zimanê biyanî ne. Têgihên felsefî bi zimanê Kurdî nehatine afirandin. Bi bikaranîna têgihan dibe ku çewtiyên me hebin. Dibe ku kêmasî û çewtiyên me di hûnandina hevok û bikaranîna hin peyvên de jî hebin. Lê belê, ez bawer im ku em bi awakî erênî alîkarî, pêşniyarî û rexne li hev bikin, emê di vî warî de gav û gav pêş kevin. Bi min ev peywireke netewî û mirovî ye û li ser milên me ye. Divê di pêkanîna vê peyvirê de gav bê avêtin.

Her kes û her camêr hay ji girîngiya bikaranîna zimanê mader he-

ye. Ji xwe qedexekirina zimanê mader, taybetiyeye mêtîngehkariyê ye. Hebûna civatek, zimanê wê ye. Dema civatek ji zimanê xwe dûr keve, yan jî zimanê xwe hunda bike, ew civat bi hêsanî hildîweşe û bindest dikeve. Digel vê, taybetiyeye mêtîngehkariyê jî, di warê felsefî de ye. Du xêzên rêzanî (siyasi) tên ajotin. Ya yekemîn bîr û bawerî û bîrdoza wê civatê ji holê tê rakirin. Lewre bindestkirina civatek bê bîr û bawerî hêsanî e. Ya diwemîn afirandina bîrdozeke fermî ye. Ev bîrdoza fermî angora teybetiyên wî welatî mêtîngeh tê saz kirin. Berjewendiyên mêtîngehkarî diparêze û armanca wê, domandina mêtîngehkariyê ye.

Li Tirkîyê, xasma li Kurdistanê zanyariya felsefî gelek li paş maye. Perwerdeya felsefî pir kêmtir e. Hema hema mirov dikare bêje tûneye. Ev tiştêkî rasthatinî nîne. Bi zanatî, gel û civat ji zanyariya felsefî tê dûrxistin. Loma felsefe di mejiyê mirov de pirsan çêdike. Çika lêgerîn û lêkolînê dinimîne. Şik û guman di serê mirov de diafirîne. Pêwendiyên di navbera sedem û encaman de dide zanîn. Hinav û bingeha bûyeran derdixîne ber çavan. Bi kurtî ramanêke serbixwe û azad peyda dike. Rîya ponijandin û ramankirineke rast vedike û dide nîşandan. Bi vî

Ew rîya ponijandin û ramankirineke civatê dixitimînin. Ji ber vê yekê, karê baş ew e ku civatê ji zanyariya felsefî dûr bikin. Ji xwe li gorî wan, felsefe tiştêkî ziyandar û bi xeter e. Mejiyê mirov ser û bin dike. Rê li ber mirov hunda dike. Ew di şûna civatê de diramin û rîya rast zanin. Ev bes e, êdî çi dixwazin?

Bê guman civata Kurd, vî tiştî naxwaze. Dixwaze ku çarenûsa xwe bi destên xwe binivîse û kifş bike. Ji bo vê yekê, divê mirov di warê felsefê de bi zimanê xwe yê mader kar û xebatê bike. Mebest û armanca me, ji van rêzên ha ne ew e ku em dê gotin û dîtinên nû bêjin û binivîsin. Pisporiyeye me welê jî, di vê mijarê de nîne. Armanca ew e ku êdî em bikaribin di vê babetê de bi zimanê xwe biramin (bifikirin), biponijin, baxêvin û binivîsin.

Gotineke mezinan heye. Dibêjin: "Teyr bi baskên xwe, teba bi qîl û diranên xwe û însan bi hiş û aqilê xwe digihêjin ya xwe." Dema ku hebûnên jîndar li ser rûyê erdê peyda bûne, wê gavê lec, şer û tekoşîna jiyandî dest pê kiriye. Jiyan û domandina wê ne tiştêkî hêsan e. Bi wê re, bê hejmar asteng, zehmetî û pirsgirêk henin. Digel vê, dev ji jiyandî nayê berdan. Domandina wê tiştêkî bivê-nevê ye. Hebûnên jî-

awayî civateke ramanker, pirsker û lêkolîner, bi bindestiyê qaîl nabe. Ev civat radibe li ser lingên xwe û dimeşe.

Dagîrker, mêtîngehkar û çîna serdest, civatek bi vî awayî naxwazin. Ew divên ku civat bi çarenûsa xwe ya ku wan nivîsiye, qaîl bin. Civat guhdariya wan bike û ji gotina wan dernekeve der.

dar, hem pêwistiyên (xwarin, vexwarin, wergirtin) xwe peyda dikin û hem jî xwe, ji xeteriyên diparêzin. Ji ber vê yekê pêwistiya alet, hacet û navgînan derketiye holê.

Navgînên lawiran (heywan) bi laşên wan ve ne. Ew, jiyana xwe, çawa di gotina mezinan de hatiye diyarkirin, bi alîkariya wan aletên ku bi laşên xwe hildigirin, didomînin. Lê belê, bask, qîl, nêkil û pencên mirovan nîne. Mirov bi laşê xwe, ji gişk jîndarên din bê hêz û bê gavitir e. Niha em dibînin ku mirov di qonaxê gelek bilind de ye. Dinyayê xistiye binê fermana xwe. Serdarî li her tiştî dike. Bê guman, ê ku mirovahiyê derxistiye vê qonaxa bilind, hiş û aqilê wê ye.

Mirov dikare bi aqilê xwe her girêkê pişkêve, ji bo çareserkirina pirsgerêkên xwe rîyan bibîne. Ji tengasiyan xwe rizgar bike û astengên li ber xwe ji holê rake. Ji ber vê yekê, divê mirov bizanibe wî bi kar bîne. Ji hînbûna xebitandina wî, divê mirov li dîroka ramanî û mirovahiyê binêre. Divêtiyeke (gereklilik) gelek girîng e ku mirov bizanibe mirovahî bi çi awayî gav û gav li pêş ketiye û jiyana xwe domandiye. Lewra mirovahî, ji mêj (berê) ve heya niha di her demê de angora hewcedariyên xwe yê wê demê navgîn (alet) û nirx (değer) afirandiye. Ji bo çareserkirina pirsgerêkan rê û rêzik ava kiriye.

Em dixwazin ji destpêka xêza jiyana mirovahiyê bîpîjî û şirove bikin û heya dema îroyîn bîn. Di bin vê ronahiyê de em çêtir dikarin li ser rewşa xwe ya îroyîn rawestin û pîrsa xwe baştir bizanibin. Bi vî awayî em dikarin li ser pêşeroja xwe jî bisekinin.

Di dema kevin de, ku mirov destên xwe bi serbestî bi kar aniye, bûye xwediyê aletên gelek girîng. Di wê demê de mejiyê mirovahiyê jî, di berbanga çalakiya ponijandinê de bûye. Di karvaniya jiyane de ev herdu endam bi hev re gihîştine û roj bi roj pêşve çûne; êdî hebûnên xwezayî têra mirovan nekiriye. Ji

bo peydakirin û pêkanîna pêdivêtîyên xwe dest bi çêkirina aletan kiriye. Li vir hêza mirovahiyê ya afirandî derketiye holê. Pêvajoyeke nû, di dîroka mirovahiyê de tê xuyan. Mirov, ji bo pêdivêtîyên (gereksinim) xwe dest bi guherandina xwezayê kiriye. Ji bo nêçîrê, ji dar û keviran alet çêkiriye, ji bo wergirtinê cil û kinc pêkaniye, ji bo rûniştinê xanî ava kiriye. Ev kar û bar çalakiyên zênî (hişî) dixwazin. Pêwist bûye ku mirov bizanibe, taybetiyên hebûnan, heyberan bizanibin. Û pêwist bûye ku mirov xweza û tiştên li ser henin binase. Her tiştek kêra çi tê? Çawa mirov dikare wan angora pêwistiyên xwe biguherîne? Di vê pêvajoyê de mejiyê mirov hatiye bi kar anîn.

Mirov, hebûneke civakî ye. Mirov bi serê xwe tenê nikare bijî. Tenê dikare bi mirovên din re bijî. Mirov, pêdivêtîyên xwe bi hewildana bi hev re peyda kirine û pêkanîne. Ev hevkarî û bi hev re jiyana, ragihandina navbera mirovan derxistiye holê. Pêwist bûye ku mirov ji hev re tiştan bêje. Deng dane hev ji bo ku karên wan hêsantir be. Dema ku bi hev re naxivin, nikarin bi hev re kar bikin. Di vê pêvajoyê de ziman hêdî hêdî derketiye holê. Ji xwe bê ziman ponijandin ne gengaz e. Lewra mejî simgeyên heyberan (madde) dikare di xwe de bigre. Di cihê madeyê de deng û bêjeyan bikartîne. Mirov, jî karîne bi ziman zanebûn, tecrube û dîtinên xwe ji hev re bêjin.

Çalakiyên zênî bi navgîna zimên dest pê kiriye û pêk hatiye. Di vê qonaxê de, êdî mirov aqilê xwe baş bi kar aniye. Mirov bi navgîna zimên û mêjî, ji tiştên ku di jiyana karvanî de çewt û şaşî derketiye, xwe parastîye. Ne xwestiye ku wan çewtiyan dubare bike. Dîsa mirov, ew rastiyên ku di jiyana karvanî de derketine holê, xwestiye wan biparêze. Ev rastiyên jiyane di zimên de ber hev bûne û civiyane. Gişk endamên civatê di jiyane de van rastiyên, tecruba û zanînan bi kar anî-

ne. Ev tecrube û rastî, bi navgîna zimên gihîştine nivsên (neslên) nû.

Di vê pêvajoyê (süreç) de, di jiyana mirovahiyê de rê û rêzik hatiye xuyan. Xweparastin ji çewtiyan û hînbûna rastî û tecruba rê û rêzik pêwist dike. Hînbûna rê û rêzikan bi navgîna ziman, çalakiya zênî gengaz (mumkun) e. Bi vî awayî di nav civatê de û di navbera nivsa nû û ya kevin de çalakiya perwerdeyî hêdî hêdî derketiye holê. Mirov, êdî xweştir û bi leztir kariye xwezayê biguherîne. Di eynî demê de ew kariye xwe jî çêtir biguherîne; êdî ziman, hîkarî li civatê kiriye. Tixûbên jiyane firehtir kiriye. Sînorên ramanî jî xurtir û firehtir bûne. Bi navgîna zimên, mirov kariye bi mejiyê xwe pir tiştan birame.

Bi pêşveçûyîna zimên, bi avakirina deng, bêje û têgihan û bi pêwendiyên di navbera bêje û têgihan de, çalakiyên zênî xurtir û pêşketîr bûye, êdî mirov kariye pîlan û bername di mejiyê xwe de çêbike, êdî kariye xwestin, daxwaz û hêviyên xwe birame. Û jiyana ramanî dest pê kiriye. Mirovahî derbazê qonaxa ramanê nedîtbarî bûye. Di vê qonaxê de, civat di serê xwe de dinyayeke menewî ava kiriye. Çawa civat ji bo jiyana karvanî (pratikî), ji xwe re alet û navgîn li dar xistiye, wisan jî, ji bo jiyana xwe ya menewî navgînan saz kiriye.

Ev çalakiyên ramanî bi wasita zimên pêk hatiye. Bê têgihên zimên di mejî de çalakiyên çênabin. Bi çalakiyên ramanî jî, ziman pêş ve diçe û tixûbên xwe fireh dike, peyv û têgihên nû û pêwendiyên nû û lihev-xistî diafirîne. Ziman û raman bi beramberî li hev hîkarî dikin. Ev bûyer, ji jiyana madî û karvanî re hê xw distîne. Bingeha xwe ji jiyana lebatî hildide. Ji derî lebat û jiyana karvanî raman nîne. Raman bi lebatê ve girêdayî ye. Lê piştî ku raman li ser bingeha lebatê hat dirûvandîn, dîsa dizivire lebatê. Rastiya raman û ponijandinê, di jiyana karvanî de kifş û diyar dibe.

Dumahîk heye

Evîn ji dibistanê derketibû, diçû malê. Roj rojeke xweş bû. Tîrêjên tavê yên germ li rûyê wê yê delal diçûn û dihatin. Hişê wê belawela û dilê wê wisa bi xem bû. Tiştê ku îro mamoste di dersê de ji wan re gotibû qet neketibû serê wê.

Evîn gav bi gav kete riya bi xweî û bi toz û dûman. Te digot qey tiştê nabîne û nabihîse. Gavên wê wisa zû zû û bê ser û çav bûn, weke ku ji ber tiştê bireve, mîna çivîkekê, mîna perperokekê.

Evîn bi xwe re dipeyivî, digot:

–Ez zanim ku te jî bêriya min kiriye. Lê ez nikarim dev ji dibistanê berdim, werim.

Min pir bêriya te kiriye. Jîna bê dê, ne hêsan e.

Hêstir ji çavên wê dibariyan. Rûyê wê weke gula ku baran lê dike, wisa teze û delal bû. Evîn axîneke kûr kişand, dilê wê dişewitî. Digot:

–Ez herim malê, ezê ji apê xwe re bêjim, min bêriya diya xwe kiriye.

Evîn bi dil û hişêkî tevîhev di kêleka rê de dimeşiya. Rê lê dirêj bûbû, nediqediya. Çû li ber avekê rûnişt, rawestiya. Av mîna hêviyên wê wisa zelal û paqij diherikî. Weke ku jê re digot: "Ez bi te zanim, tê rojekê bigihîjî diya xwe, lê nebî, nebî tu bê hêvî bikevî. Evîn ji nişke ve vecinîqî, li dora xwe nihêrt, roj diçûn ava. Serê xwe rakir li rojê nihêrt. Rojê di pişt ewrên reş de çav dineqandin. Evîn weke barana payîzê hûrik hûrik dest bi girîne kir.

Bi lez û bez kete rê, dereng ma bû. Niha apê wê çav li rê, ketibû meraqa wê. Evîn, pênc sal bû ku li mala apê xwe bû. Apê wê pir jê hez dikir. Biraziya wî çî bixwesta bi çî tanî. Lê zanibû ku Evîn pir bêriya diya xwe dike û rojekê wî wê bihêle û here.

evîn û welat

Besra EKSEN

Gava gihîşt malê, apê wê bi xem û zem jê pirsî:

–Tu li ku yî, çîma dereng mayî?

Evîn, serê wê di ber de çavê xwe yê bi grîn ji apê xwe vedişart. Apê wê fêhm kir ku griyaye, destê xwe di serê wê de gerand û gotê:

–Evîn, tu çîma wiha bi grîn û bi keser î? Derdê te çî ye, ji min veneşêre, gava ez te wiha dibinîm, dilê min dihele.

Evîn serê xwe bilind kir, li apê xwe nihêrt, dixwest biqîre, lê nikaribû. Dîsa kelegrîni bû serê xwe xist ber xwe.

Apê wê li pey bû, wê tu car wiha nedîtibû. Gelo wê bi hinekan re şer kiribû? Qey kesek jê re tiştê gotibû? Evîn heta niha bi kesî re pev neçûbû. Îro pir bi keser bû, apê wê ji xwe re digot; gelo Evîn çîma wiha bi xem e.

Apê wê gotê:

–Qîza min, bêje ka tu çî dixwazî, ez bînim cih.

Evîn li apê xwe nihêrt, axînek kişand, got:

–Min pir bêriya diya xwe kiriye, ez pir dixwazim wê bibînim. Îsal, piştî dibistan biqede, ezê herim malê.

Apê wê qasekî fikirî, lê nizaniyê ku derdê braziya wê ev e. Çavê wî tije hêstir bû. Zanibû ku wê Evîn rojekê terka wî bide, here ba diya xwe. Lê bi rastî nizaniyê ku wê evqas zû ji Evîn biqete. Evîn fêhm nedikir ku apê wê çîma hewqas bi jan û keser e. Digot min çîma lê wiha kir.

Apê wê dipeyivî, jê re digot:

–Tu tenê bêriya diya xwe dikî. Ez bêriya hemû tiştan dikim. Guhê wê li apê wê bû û ji xwe dipirsî, digot:

–Gelo apê min bêriya çî dike?

Dê û bavê wî, ji zû ve miribûn, ji wan pê ve kesê

wî yê ku bêriya wan bike jî tunebûn. Jê pirsî, gotê:

–Te bêriya kî kiriye?

Apê wê got:

–Te bêriya diya xwe kiriye, min bêriya welatê xwe, bêriya gundê xwe yê ku ez tê de mezin bûm, bêriya gundiyan xwe... Bi evîn û dilsojî mirov çawa bêriya dê û bavê xwe dike, mirov bi vî awayî bêriya welatê jî dike. Tê bîra te? Kalê te nexweş bû, hatibû ba me, piştî çendêkî bêriya welatê kir, got, 'ku ez mirim, min li vir veneşêrin, min bibin welatê bav û kalan, min bibin gundê me...' Wê hingê min digot bavê min çîma wiha dibêje, lê niha ez tê dighêjim.

Apê min dom dikir:

–Zarok ji min re çênebûn, min te ji dê û bavê te xwest, min got bila bibe keça min, ezê wê xweyî bikim. Dilê wan pir nedixwest; lê dîsa jî dilê min nehiştin. Kêfa min hat, lê min zanibû ku rojek tu dê li wan bigerî û terka min bikî. Me weke dê û bavê te yên helal li te nihêrt. Berê tu qet li wan negeriyayî, lê îro tu li wan dipirsî. Heq û rast e ku diya mirov a helal ji mirov re ji her tiştî pîroztir e.

Evîn bi van gotinên apê xwe şa

bûbû. Dixwest ku apê wê hinek tiştan eşkere bêje. Evîn jê pirsî:

-Tu çima li pey daxwazyên xwe naçî? Were em bi hevdu re herin, ezê bigihîjim diya xwe û tê jî bigihîji welatê xwe.

Çavên wê dibiriqîn.

Apê wê got:

-Tu rast dibêji.

Hay jê nîn bû ku dilê Evîn bi kovan û kesera welat dagirtî ye. Evîn li ser welat dipeyvî, digot 'welat... welat...'

Gotina pêşyan e: "Bê zehmet, mirov naxwe nemet." Evîn digot:

-Çima em jî negihîjin daxwazyên xwe, em ji bo vê yekê çi dikin?

kir, qasek wisa kete fikr û xeyalan. Apê wê hate bîra wê, digot: "Min jî bîriya welatê xwe kiriye." Ew li ser diya xwe peyivîbû, lê ji apê xwe hinek tiştên din bihîstibû. Peyva wan a li ser welat ji hişê wê dernediket.

Dixwest razê, lê xew bi çavê wê nediket. Diya wê hat bîra wê, çavên wê tije girî bû. Rabû pencerê vekir. Şevêkî tarî bû, stêrk diçirîsîn. Axînek kişand, gote wan: "Bextê we jî weke we ronî ye, li ezmên hûn bi serê xwe ne, serbilind in. Xwezî bi we.

Evîn berdestê sibê di xew de çû. Bi tîna tavê ku ji pencera wê ya vekirî dikete hundir, şiyar bû. Dilê wê nedixwest here dibistanê. Westi-

kê xemilandî bûn. Xweza (tebîat) pir rind û bedew bû, av bi evînî diherikî, mûrî bi eşq û bawerî, bê sekin dixebitin. Evîn bi xwe re dipeyivî, digot: "Qey qet derd û kulê wan tune? Xwezî ez di şûna wan de bûma..." Berê xwe da rojê, tîrêjên rojê li rûyê wê dibiriqîn. Germa rojê, diya wê anî bîra wê. Serê xwe xwar kir, çavê wê bi kûsiyekî ket, di nav avê de bû. Kûsî dilepitî û ber xwe dida ku ji avê derkeve, lê çawa ku piyê xwe davêt, wisa jî dişimitî û di hate xwarê, nikaribû ji avê derkeve. Evîn jî lê dinihêrt û dikeniya. Pariyek kêfxweş bû bû. Nedixwest çavê xwe jê bineqîne, li kûsî dinihêrt.

Ji nişke ve beqek ji ber piyê Evîn çind da û derbasî wî aliyê avê bû. Berê beqê li Evîn bû, wisa mîna ku lê binêre. Evîn kevirekî biçûk avêtê, beqê çindek da xwe, çû ser kevirekî.

Evîn çavê xwe li kûsî gerand. Kûsî bi keftelefteke zor ji avê derketibû, xwe dabû ber tavê. Evîn di xemên kûr û dûr de bû. Gotinên apê wê, ji bîra wê dernediket, digot: "Apê min rast dibêje. Ji jiyane xweştir û zortir tiştek tune. Ji bo ku mirov bigihîje daxwaz û xwezyên xwe, divê mirov ji têkoşînê nereve. Kûsî laxer û giran, beq sivik û beza ne, lê herdu jî ber xwe didin, bi têkoşîn dijîn. Ew jî mîna me, ferqa me û wan ji hev çi ye?"

Dilê Evîn ketibû cih. Pir kêfxweş bû bû. Ji nişke ve ji cihê xwe rabû, çavê xwe li kûsî û li beqê gerand. Evîn êdî çêtir zanibû ku jiyane bê xebat û têkoşîn nabe. Evîn li wan digeriya, lê ew ji zû ve ber bi jiyaneke nû bi rê ketibûn.

Evîn di qeraxa avê de bazdida, fikr û hêviyên xwe bi dengê bilind diqirîya:

-Ez tîm dayika min a delal. Ez tîm, welatê min ê xweş, ez tîm jiyana bi rûmet. Ez tîm, ezê bi we re bijîm.

Evîn di nav bajêr de ji xwe razî, bi bawer û serfiraz, bê xem û keser dimeşiya. Bi hêvî, bi bawerî û bi biryarî...



Ji bo vê, qey emê tenê ji Xwedê re bizarin?

Bi vî awayî, Evîn kete fikr û ramanan. Ji apê xwe pirsî:

-Qey emê ji bo vê neçin welatê xwe?

Apê wê got:

-Belê, wê ew roj jî were; lê divê gelê me tev bi hev re ber xwe bide.

Bû bû nivê şevê. Evîn ji ba apê xwe rabû, çû oda xwe. Xwe dirêj

yabû. Derket ber derî, li dora xwe nihêrt, ji wê pê ve kes tunebû. Ji dûr ve dengê zarokan dihat.

Bê dilê xwe kete rê. Ew riya ku berê bi kêf û şahî tê de diçû û dihat, îro qet li dora xwe nenihêrt, meşiya... Çû li ber newalê rûnişt, her tim ku ji dibistanê dihat, li vir bêhna xwe dida û kevir davêtin avê. Bala xwe da vê ava ku zelal diherike. Gul û sosin li qeraxa avê weke bû-

HALKIN AYDINI HALKIN SAVAŞÇISIDIR (3)

1938 baharında Dersim'e yönelik operasyon başlatıldı. Öte yandan İran, Irak ve Suriye hükümetleriyle, Kürdistan sorununa ilişkin antlaşmalar imzalanmıştı. (Bu dönemde Irak İngilizlerin sömürgesi, Suriye ise Fransızların sömürgesiydi) Bu antlaşmalar ile, Kürt isyanlarına karşı güçbirliği yapılması ve ortak tavrı takınılmasını hedeflemişti. Bombardıman uçakları ve topçu ateşi altında aylarca inleyen Dersim, son kurşununa kadar kahramanca direndi, kızlar ve kadınlar namuslarını ve benliklerini düşmana teslim etmemek için kendilerini uçurlardan attılar.

Avrupa'daki bazı Kürt aydınları, Birleşmiş Milletler'e ve Avrupa'daki hükümetlere çağrıda bulunarak, Dersim katliamının durdurulmasını istediler. Bu çağrılar yanıtız kaldı. Kürt toplulukları, dünyanın gözleri önünde, kendileriyle kıyaslanamayacak ölçüde güçlü silahlara sahip bir düşman tarafından barbarca boğazlandılar.

Sayıları yüzbine varan Dersim'linin öldürülmesiyle, Dersim katliamı tamamlandı. Sömürgeciler bununla da yetinmedi. Onların sıradaki isteği, Kürt insanının beyniydi. Resmi faşist TC ideolojisi her tarafta ege-men kılınmakta, asimilasyon her tarafta futursuzca uygulanmaktaydı. Resmi faşist TC ideolojisinin Kürtlere de traji-komik bir tarzda dayatılan ırkçı sloganları şunlar oldu: "Ne mutlu Türküm diyene! Bir Türk Dün-

yaya Bedeldir! Türk Öğün, Çalış, Güven! Muhtaç Olduğun Kudret Damarlarındaki Asil Kanda Mevcuttur! vd. Kiralık bir çok uşak yazar, Kürtlerin Türk soyundan geldiklerini, Orta Asya'dan göçetmiş olduklarını, Kürtçe denilen dilin 20 30 kelimedenden oluştuğunu vb. on yıllarca tekrarlayıp durdu. Bu konular üzerine sahte profesörler binlerce kitap yazdılar. Bu utanç belgeleri bugün de Türk Kütüphanelerinin raflarında durmaktadır. Katliamlar sonrası boşaltılan Kürt illerinde ve tüm Misak-ı Milli sınırları içinde, Türkçe konuşulması, Türkçe düşünülmesi zorunluluğu kanunlarla denetim altına alınarak, Kürdün beyni darmadağın edilmek istendi.

Amaç bellidir; Kürt benliğinin beynlerden boşaltılması hedeflenmiştir. Benliği boşaltılan bir ulusu düşürmek, kendisine yabancılaştırmak basittir. Kürdün Türk gibi düşünmesini, Türk gibi giyinmesini, Türk gibi konuşmasını, Türklüğü savunmasını sağlamak, sömürgeci faşist devletin resmi ideolojisi olmuştur.

İkinci dünya savaşından galip çıkan ABD emperyalizmi sömürgeci sofrasında aslan payına sahip oldu. Bir grup eski İttihat ve Terakkici komprodorların önderliğinde ve ABD'nin desteğiyle, 1946 yılında kurulan Demokrat Parti 1950'de iktidara geldi. DP'nin peşine takılan Türk solu ve ona "İkinci Kuvvay-i Milliye" sıfatını yakıştıranlar yine aldanmışlardır. DP ile birlikte kurulan

küçük sol partiler kısa zamanda kapatılmış, yöneticeleri tutuklanmıştır. DP iktidarı, sömürgeci faşist rejimi daha da pekiştirmiş, emperyalist ülkelerin artık mallarını Kürdistan'ın en ücra köşelerine pazarlayabilmek için yollar yapmış, faşist ideolojiyi pekiştirmek için okullar açmıştır. Kore'de ABD emperyalizminin çıkarları için Kore halkına kurşun sıkılmıştır. Bu alçakça davranış faşist devletin Nato'ya kabulünü sağlamıştır.

Hürriyet ve demokrasi sloganları ile ortaya çıkan DP'nin ideolojik ve pratik işlevleri kemalistlerden farksızdı. 1959 yılında 49 Kürt tutuklanıp cezaevine konulmuştu. Bunların bir tek suçu vardı, o da Kürt olmak. On yıllık faşist DP iktidarı, Türk halkına zulüm ve sömürüden başka birşey sunamamıştı. 1960'lara gelindiğinde, Türkiye kaynıyordu. DP iktidarının orduyu kısmi olarak siyasetten uzaklaştırmak istemesi ve Başbakan Menderes'in "gerekirse orduyu başçavuşlarla idare ederim" beyanı, kemalist geleneği kısmen de olsa "yaralamıştı". Türk devletinin ABD emperyalizminin kayıtsız şartız uydusu oluşu, Avrupa emperyalistlerinin de hoşuna gitmiyordu. Avrupa'nın desteği ile askeri ve sivil kemalistler 27 Mayıs 1960 darbesini gerçekleştirdiler. Cunta liderlerinden Cemal Gürsel, İnönü'ye yazdığı mektupta, "her isteğiniz bir peygamber emri gibi telaki edilecektir" diyordu. 1960 cuntası Türk halkına küçük bir soluk aldırırken, Kürdistan üzerindeki şiddet devam ediyor-

du. Cunta genel af çıkarmış, ancak 49 Kürt insanını bu affın kapsamı dışında bırakmıştı.

1940'larda başlayan şeyh ve ağaların ajanlaştırması işlemi, DP döneminde tamamlanmıştır. Kürdistan'lı şeyh ve ağalar, DP'nin sadık birer uşakları olmuşlardı. Bu vesile ile 27 Mayıs cuntası, DP'li Kürt ağalarını da hedef almıştır. Tanınmış şeyh ve ağalar sürgüne gönderilmiştir. Sürgüne gönderilen bu ağalar, sürgünde millete, vatana ve cuntaya bağlılık yeminleri ettirilerek bir yılı aşkın bir süreden sonra geri dönmelerine izin verilmiştir. 1961 yılında hukuk profesörü Mümtaz Soy-sal'a hazırlattırılan 1961 Anayasası, Mussolini'den ödünç alınan TCK'nin 141 ve 142. maddelerini korumakla birlikte, kısmi olarak örgütlenme özgürlüğünü birlikte getiriyordu.

1960 sonrası kurulan TİP (Türkiye İşçi Partisi) reformist ve pro-sovyetik özellikleriyle birlikte Türk-solunda bir dönüm noktasıdır. 1965 yılında anti-marksist Kürt aydınları tarafından TDKP kuruldu. Bu parti, ideolojisi gereği anti-marksist aydınları, küçük toprak sahiplerini, esnaf kesimi örgütlemeyi hedeflemiştir.

Bir kısım reformist, marksist Kürt aydınları TİP içinde örgütlenmeyi yeğlemişlerdi. İsmail Beşikçi, işte bu zaman dilimi içerisinde karşımıza çıkıyor. Beşikçi 1963-64 yıllarında askerlik görevini Bitlis'te yaptığı yıllarda, Kürdistan'ı ve resmi ideolojiyi pratik işleviyle yakından tanıma fırsatı bulmuştur. Bu tanışma, onun yaşamında yeni bir dönüm noktası oluşturur. 1964 yılında Erzurum Atatürk Üniversitesi'nde sosyoloji asistanı olarak çalışmaya başlayan Beşikçi, doktorasını 1967'de tamamladı. O dönemde başlayan Doğu mitingleri ile ilgili ilk analizini 1967 yılında kaleme aldı. 1969 yılında "Doğu Anadolu'nun Düzeni, Sosyo-Ekonomik ve Etnik Temelleri" adlı kitabını yayınladı. Bu kitabını yayınladığı için Atatürk Üniversitesi'ndeki görevine son verildi. Kısa bir

dönem Ankara Siyasal Bilgiler Fakültesi'nde çalışan Beşikçi, 12 Mart 1971 Askeri faşist darbesiyle birlikte tutuklanarak Diyarbakır Askeri Cezaevi'ne kondu.

1968 yılında kurulan Devrimci Doğu Kültür Ocakları Kürt gençliğinin ilk uyanışıydı. Son Dersim katliamı ile serpilerek ölü küllüne ilk tepkiydi. 1970 yılında Beşikçi'nin DD-KO'yu ilk kez ziyaret etti. Daha sonra bu dernek bünyesindeki gençlerle, cezaevinde bir zaman dilimini birlikte geçirmiştir.

TC kararlıydı. İsmail Beşikçi cezalandırılmıyordu. Erzurum'dan, Ankara'dan resmi ideolojinin kiralık profesörleri uçaklarla Diyarbakır'a getiriliyor ve Beşikçi aleyhinde muhbir tanıklar olarak ifade verdiriliyordu. Bunlardan birkaçının isimleri şöyle: Pr. Dr. Kemal Bıyıkoğlu, Pr. Dr. Orhan Türkdoğan, Pr. Dr. Şaban Karataş, Pr. Dr. Mithat Torunoğlu ve asistan Dr. Erol İbrahim Kozak. İbrahim Kozak'ın 25 Mart 1972 tarihinde Beşikçi'ye gönderdiği hakaret dolusu mektubuna burada değinmekte yarar var. Resmi faşist devlet ideolojisinin kiralık uşağının buradaki suçlamaları ile, "Kürt ve Kürdistan ülküsü" adına yola çıkan bazı güçlerin Beşikçi'ye yönelik suçlamalarının aynı paralelde olması özellikle dikkat çekicidir. Muhbir öğretim görevlisinin mektubu şöyle başlıyor:

"İsmail Beşikçi, malum etnik bir grup seni kandırıyor, seni posanı çıkarıncaya kadar kullanacaklar; ondan sonra da seni çöp tenekesine atacaklar. Duruşmalarından sonra ben senin avukatlarından birinin konuşmasına tanık oldum. Sen onların umurlarında bile değilsin; onlar kendi keyfinde... Senden elbette yararlanacaklar, seni ciddi bir şekilde savunmaları bile söz konusu değil. Senin zayıf bir kişiliğin var. Bu bakımdan çok kolay ve çabuk bir biçimde etki altında kalıyorsun. Fakat nefis muhasebesi yapmak suretiyle düştüğün gafletten ve çukurdan kurtulabilirsin."

Mektubun diğer bir paragrafında, muhbir öğretim görevlisi şu görüşlere yer veriyor:

"Bu sorun (Kürt Sorunu) Türk milletinin, Türk devletinin bütünlüğü ile ilgili bir konudur. Bu konuda tartışma açılmaz. Bilim bu konuya alet edilemez. Bu sorunlar fikri tartışmayla değil, kurşun kurşuna hal edilir."

Muhbir öğretim görevlisi son paragrafta haklı bir konuya temas etmişti. Resmi faşist ideolojiyi üreten üniversitelerden bu konunun tartışılması veya tartışılmasına mücade edilmesi beklenemezdi. Sorun kurşun kurşuna çözülecekti. 1974 af yasasıyla birlikte İsmail Beşikçi tahliye oldu. Resmi faşist ideolojiyi üreten üniversiteler Beşikçi'yi kabul etmediler. Üniversitelere kabul edilmeyen Beşikçi, kendini bilime verdi. 1976 yılında "Bilim Yöntemi" adlı kitabını yazdı. Ardından, 'Kürtlerin Mecburi İskanı'nı 1977, 'Güneş Dil Teorisi ve Kürt Sorunu' adlı çalışmasını da 1978'de tamamladı. Onun yazdığı bütün kitaplar hakkında dava açılmıştır. Bir bilim adamı olarak, resmi ideolojiyi bilimsel olarak eleştirmesini TC hazmedememiştir. Bu kitaplardan dolayı hakkında dava açılıp, 1979 yılında kesinleşen bir mahkumiyet kararından dolayı Beşikçi tekrar cezaevine konuldu.

12 Eylül faşist askeri darbesi ilk elden idam sehpaları kurup onlarca yurtsever asarken, Kürdistan'daki bütün köy okulları ve karakollar birer işkence yuvasına dönüşmüştür. Onlarca devrimci işkencehanelerde katledilmiştir. Beşikçi, bu barbarlığa, İstanbul Toptaşı Kapalı Cezaevi'nde Fransızca olarak kaleme alıp İsviçre Yazarlar Sendikası Başkanı Bayan Boulanger'e göndermiş olduğu 14.08.1980 tarihli mektupta kısaca değinmiş ve bu mektuptan dolayı Beşikçi hakkında yeniden dava açılmış, suç işlediği gerekçesiyle cezalandırılmıştır. 1981-87 yıllarını cezaevinde geçiren bu aydın, onurlu kavgasının diyetini ikinci adresi olan cezaevlerinde ödemiştir.

HACÎ QADIRÊ KOYÎ (1815 - 1897)

Abdurrahman DURRE

Şairê niştimanperwer û mezin Hacî Qadir, Mele Ebdurehmanê kurê EHMEDê kurê Muhemedê kurê Mele EHMEDê Gewre ye. Gewre, bi zaravê Soranî, bi mana "mezin" e.

Hacî Qadir, di sala 1231 ê koçî (hicrî) de, yanê di sala 1815ê miladî (zayînî) de, li gundê Gorqereca, bajarê Koyê hatiye dinyayê. Koy = Koysenceq, bajarekî Kurdistana Başurê, nêzikê Kerkûkê ye.

Navê dayika Hacî Qadirê rehmetî jî, Fatê (Fatma) ye. Çawan ku Hecî Qadir jî di helbestên xwe de gotiye:

Bawkem Ehmed bû, nawî fikrêm dê
Xelkê ladê bû, daykî men Fatê

Yanê: bavê min Ehmed bû, navê wî tê bîra min, jî xelkê LADê bû, dayka min jî "Fatê" bû.

Çawan ku jî wî helbesta Hacî Qadir jî, tê fêhm kirin, Hacî ku dema bavê wî wefat kiriye, zarok bûye.

Hacî ku dibe heftsalî, dayka wî, ew dibe ba kurxalê wî yê "Mele Ehmed" dide ber xwendinê, piştî du salan dayka Hacî jî wefat dike. Mele Ehmed mesrefa xwendina Hacî dide ser xwe. Hacî, feqîtiya xwe ya seretayî (îbîfîdaî) li Koyê didomîne. Di salên 1853-1854'an de, digel "Hacî Mele Ebdullahê Cefîzade diçin Baleketê gundê Şêxwetman, li ba "Mele Muhemedê kak Ebdullah" dixwînin, piştê wî, Hacî Qadir jî hevalê xwe Mele Ebdullah diqete bi tenê diçe Kurdistana Îranê li bajarên Serdeşt û Sablax û Şînoyê, dixwîne. Heta sala 1862-3'an li Kurdistana Îranê dimîne. Di wê salê de (1863) îcazeta xwe (destûrname-dîploma) distîne, dizivire welatê xwe (bajarê Koyê). Di gel Mele Ebdullahê heval û dostên weke "Şair Emîn, Axa Exter" û "Heme Axa" midetekî (demekî) li Koyê dimîne. Û piştî wî dixwaze ku here Stenbolê, anku paytaxta Osmanî û digel rewşenbîran xebatê bike. Li ser vê, Hacî berê xwe dide welatê xurbetê û tê Sten-

bolê, digihîje binemaliya malbata Bedirxaniyan û dibe mamostayê zarokên wan.

Hacî heta ku nehatibû Stenbolê, helbesteyên evîndarî û dildarî dinivîsin. Piştî ku hate Stenbolê, bi rewşenbîran re hevaltî kir û bi komele û tevgerên azadî û netewiyên biyanî (ecnebî) re aşîna bû. Li vir dek, dolab, pîlan, fend û fêlên ayînfiroş (dînfiroş), bazirgan, mîr, axa, beg û paşayên curbicur dît. Bi şairên wekî Şînasî, Namik Kemal, Abdulheq Hemît, Tewfîk Ziyaeddîn û Ziya Paşa re têkiliyên wî çêbûn. Seltenet û debdebe yên Stenbolê, çerx û dolabên wî yên siyasî, tîcarî û civakî dîtin; feqîrî, belengazî, bêkesî û bêxwedîtiya Kurd û Kurdistanê rind fêhm kir. Agirê xurbetê û hesreta Kurd û Kurdistanê di dil û canê wî de hilbû. Çik, şewat û jana birîna welêt, li cerg û hinav û hestiyên wî rûnişt. Wê demê dest bi helbesteyên netewî û gelperwerî kir û rêçeke taze û nû di warê wêjeya Kurdî de vekir.

Bi rastî jî, hacî Qadirê Koyî, jî wê demê vir, de ala wêjeya netewî jî destê şair, feylesof û zaniyarê mezin Ehmedê Xanî hilda û da ser milên xwe û serfiraz kir. Zilm û zor û dagîrkerî (îstîla, sömürgeçilik) ya Osmanî û Eceman telîn û teşhîr kir û got:

Le mabeynê kilawsor û kilawreş
Perîşan in debîne mislê gaybeş

Yanê: Em Kurd di navbera kumsor û kumreşan de (Osmanî û Eceman de) perîşan mane, bûne wekî Koyê Beş ku her kes pê olama xwe dike, nû barê xwe lê dîkin.

Çawan ku Ehmedê Xanî jî, di dibaca "Mem û Zîn"a xwe de gotiye:

Herdû terefan qebîlê Kurmanc
Bo tîrê qeza kirine armanc

Herdu terefan, yanê: Rom (Osmanî) û Ecem êl û eşîrên Kurdan kirine armancê tîrên qedere û wan pê dijenir.

Hacî, çara xelasiyê, ji bindestiya koledaran û dagîrkeran (sömürgeci-istilacilar) jî, di cenga çekdarî û xwendin û zanîn û qelem (xame, pênuş)ê de dibîne û dibêje:

Selahê îwe îstaqê silah e
Temayê gewreyî bê çek nekin nek

Yanê: Kara we, qenciya we di vê demê de, di sîlehan de ye. Arzûtiya mezinayî û serbilindiyê bê çek û sîleh nekin û nekin; yanê bê sîleh azadî nabe...

Bê şîr û xame dewlet payîdar e
Emen, xame heye, şîr na diyar e

Yanê: Bi şûr û qelemê dewlet payîdar dibe. Qelema min heye, lê şûrê min tuneye.

Herwiha mamosta Hacî Qadir, bi çavekî dûrbîn û şoşşerger li meseleyê nihêriye û heqîqet û rastiye dîtiye.

Azadî, serfirazî, bûka qelen ku xûn e
Lê pir şehîd û xazî heta niha ku çûne

Mamosteyê mezin Hecî Qadir, di warê netewîfî û gelperweriyê de li qora pêşîn bûye, dijê şêx û meleyen çilek û sextekar jî bûye.

Sed şêx û mela w Emîr û xanî
Bo lezzetê eyş û zindeganî
Lew la we ewan bi hîlesazî
Lem la we eman bi teqlebazî

Yanê: bi sedan şêx û mele û mîr û xan ji bo lezzet û kêf û jiyane li wî alî bi hîlebazî, li wî alî jî bi teqlebazî diçin û tên.

Hacî di helbestekî din de jî, wiha dibêje:

Belê şêx qutb e, emma qutt bê aş e
Be av û nîmetê xelkê geranî

Qutub, navê hesinê li binê teverê aş e ku aş li ser wî digere. Di sofîtiyê de jî navê curekî weliyan e. Hacî di vê helbesteya xwe de dibêje ku "şêx qutb e, belê qutbê aş e, gera wî bi nan û nîmetê xelkê ye. Yanê, li ser pişta xelkê dijî.

Hacî di pir cihên dîwana xwe de hêrîş daye şêxên zemanê, pir gotinên giran di derheqê wan de gotiye:

Be çawê kilderav û rîşê panî
Le jenheldî be mislê ker li xanî

Yanê: şêx bi çavên xwe yên kilkirî û rûyê xwe yê pan, wekî kerê xanî li dû jinan û tolaziyê ye.

Hacî Qadir hem şaîrekî netewî yê mezin e, hem jî zanyar û feylesof bûye. Lê belê tu carî ji fikr û baweriya olî (dînî) pêşvetir neçûye. Yanê, rnele bûye, lê melekî zana û şaîr û feylesof bûye.

Hacî ji welatê xwe û ji mêrekê Baban jî, pir û pir hez kiriye. Heta roja mirinê hesreta welat û Kurdistan çik û şewata xerîbiyê ji dil û canê wî derneketiye.

Di helbestekî xwe de wiha dibêje:

Lê xurbet be şahî le bîr nakerî
Zemanê cuwanî yû yadê welat

Hacî, di helbestekê xwe ya din de jî, ku li Stenbolê rastê hemşehriyekî xwe tê, wiha dilûvîne û dibêje:

Le Roma kewt e ber çavem kesikî haîm û heran
Be heyet têqeyîm Kurd e be şîwe ehlê Kurdistan

Ku çûme xizmetê pirsîm: birader xelkî kam cikey?
Le kam la hatûwî, girya gutf: "Baban" gutem: "Baban?"

Yanê: çavê min li Romayê (Stenbolê) bi kesekî belengaz û sews û ket, min ji şikl û şîwe û zaravayê wî fêhm kir ku Kurd e û xelkê Kurdistanê ye, ez çûm xizmeta wî û min jê pirs kir: "Birako, tu ji xelkê ku yî? Ji kîjan alî hatî?" Giriya û got: "Baban". Min got: "Baban?" Yanê, ez pir pê şa bûm û lê heyîfîm.

Em dikarin bêjin ku Hacî Qadir feylesof jî bûye. Lê belê bi kurtî: mirov dikare bêje ku Hacî Qadirê Koyî di warê wêjeya netewî de peyakî bê hempa ye, zanyarekî pir mezin û hêja ye. Di wî warî de ji hemçerxê xwe yê Saîm, ji Nalî û Keyfî û Kurdî pir zêdetir bûye.

Di helbestên Hacî de pir hunermendiyên mezin û hêja yên wêjeyî hene. Rewşên klasîkî yên wêjeyaniya Kurdî bi hemû cûrên xwe di helbestên Hacî de cih girtine û hatine hûnan. Weke gerdaniyên ku ji dur û gewheran e, bûne xemla gerdana Kurdistanê.

Çawan ku ew bi xwe jî, di helbesta xwe ya bi navê "zemanê" de dibêje ku ji Kurdan ji bilî Hacî û Şêx Ehmedê Xanî tu kesî hîmê risteyên Kurdî (nezmên Kurdî=helbestên Kurdî) dananiye.

Le Kurdan xeyrê Hacî, Şêxê Xanî
Esaşê nezmê Kurdî danenawe

Ruhên wan ên pîroz şa bin, rehma Xwedê li ser wan bin.

Henîka Henaran

Selahattîn MIHOTULÎ

Hebû, tu nînbû, li Arya Başûr mî-rekî pir bi nav û deng hebû. Heft sed malên wî mîrî, tev pismamên hev bûn. Keçeke mîr pir bedew, bejnzirav û delal hebû. Ew, delaliya êla mîr bû. Xortên êla mîr, benda vê keçê bûn. Navê keçikê Henîka-henaran bû. Dilê kurapê Henîka Henaran ketibû wê. Kurapê wê heft sal bû ku wê dixwest, lê bavê wê nedida. Rojekê, Henîka Henaran bi hevalên xwe ve diçin bindarûkê. Ew, bi hev re diîzîn, distirên û teşiyê dirêsin. Zadê ku ji mala xwe anîbûn dixwin, bi hev re henekan dîkin, laqirdiyan dîkin. Ji dûr ve ew babîfskekî dibînin. Ew lê mêze dîkin, dinêrin ev siyarek e. Siyar (siwar) nêzîk dibe. Ew xortekî çeleng, bejnbilind û simbêlreş e. Siyar di ber wan re dibore, li wan dinêre, lê bi lez derbaz dike û diçe. Keçik lê dinêrin, bi hev re dibêjin:

– Ev çi xortekî çeleng bû, hema layiqê Henîka Henaran e. Xwezî ew bibiwa mêvanê bavê te.

Keçik ji hev re van gotinan dibêjin û dizivirin gundê xwe.

Henîka Henaran tê malê, lê dinêre ku hespê siyar di hewşê de girê-

dayî ye. Ew derbasî aliyê jinan dibê, lê di qulika derî re dinêre ku xort bi bavê wê re dipeyîve. Ew guh dide, dengê wan dibihîse: "Ez li ser qayidê Hurmuz û Zerdeşt dixwazim bi keça te Henîka Henaran re bizewicim."

Bavê Henîka Henaran bala xwe dide xortî, dinêre pergara wî, rûniştin û peyivandina wî û dibêje:

– Kurê min, çima tu kesekî te tunebû ku tu tenê hatî xwezgîniyê? Bavê te, birayên te, giregirên we, nikarin ji te re bêne xwezgîniyê?"

Xort bi awayekî pisporî dibêje:

– Belê tu kesekî min nîne, ez hemu karên xwe tenê bi serê xwe diqedînim. Min qelenê keça te jî bi xwe re anî, ezê bidim û jîna xwe jî hildim bibim. Ez mirovekî pir bi lez im, li hêviya dergistiyê (nîşanê), dîlanê û hatin-çûyinê jî nikarim bimînim. Tu çi qelen dixwazî ezê bidim.

Xort xurca xwe vedike, û li ber mîr vala dike. Zêr ber mîr dibe qûç. Ev zêr, têra qelenê deh keçan dikir. Mîr van zêran dibîne hiş ji sêrî diçe:

– Hemin tu dixwazî jîna xwe behrî, divê tu sê rojan destûrê bidî ku em kar û barên xwe bikin."

Xort zêran dide mîr dibêje:

– De wisa ne ez herim, sê roj şûnde dîsa tîm, lê bila Henîka Henaran heta pişt nepenî bê, ezê jê re çend gotinan bêjim.

Mîr difikire û, 'hemin min qelenê xwe stand. Ew jî dergistiya wî ye, bila pê re heta pişt nepenî here çi dibê', dibêje.

– Hespê wî zîn dîkin. Xort xwe davêje ser hespî û diçe pişt nepenî. Henîka Henaran jî li pey diçe pişt nepenî. Xort, Henîka Henaran davêje terkiya xwe, notla bobelîskêkî ji wir dûr dikeve diçe. Hewariyê digîhînin mîr ku siyar keçik revand. Ew dîkin ku li pey bikevin, lê mezinên êlê dibêjin:

– Hemin me qelenê xwe stand. Îro ne bibiwa sê roj şûnde dê dîsa bibiwa, de hema bir, bir. Xort bû, taw neda, bila bibe.

Xort, Henîka Henaran direvîne, diherike û diçe.

Ji ser vê qewimandinê de salek dibore, ji xortî jî, ji Henîka Henaran jî, tu xeber dernakeve. Çavên wan li rê dimîne, lê tu kes nayê û naçe. Mîr gazî kurê birayê xwe yê dilketî-

yê Henîka Henaran dike û dibêje:

– Te heft sal Henîka Henaran xwest min wê neda te. Lê tu pey here wê bîne, ez bidim te. Têkeve ser rêça wan here.

Birazê wî dibêje:

– Xwedê mala te xerab bike, ez çi awayî herim, ez çi zanim bi ku de çûn. Wê bir kuşt, firot, çi kir?

Mîr dibêje:

– Riya ku ew lê çû, rêça wî li ser axê tê dîtin, li ser wê rêçê here.

Kurapê Henîka Henaran, kar û barê xwe dike, li hespê xwe siyar dibê dikeve ser rêça wan diherike.

Pir diçe, hindik diçe, diçe dikeve nav mêşekî (daristanekî), qasekî di nav mêşe de dimeşe, rastî xaniyan, hewşan û avahiyan tê. Lê di wir de tu kes tunebû. Bala xwe didê, di nav avahiyan de qesrekî dibîne, ji wir dûkî zirav quloz dibû. Diçe ber deriyê qesrê, derî dikute, derî vedibe, û Henîka Henaran li ber çavên xwe dibîne. Her du bi hev re xwe davêjin hambêza hev. Henîka Henaran dibêje:

– Kurap, tu bi çi teherî hatî, te çawa rê sererast kir?

Kurapê wê, gotina bavê wê û rêça hespê, jê re dibêje, bavê te got:

– Here Henîka Henaran peyda bike, bîne, bila ew bibe jina te, ez hatim te biherim. Lê mêrê te li ku ye?

Henîka Henaran dema van gotinan bihîst şad bû. Destê kurapê xwe girt, bire hundir û jê re got:

– Kurap can, tu ser çavan re hatî, ew xortê ku ez revandim, mêrê min nîne. Ew, ez ji xwe re ne anîm, ez ji bo meymûnekî anîm; êvar êvar, meymûnî bi zincîrê ve tîne berdide ser min, meymûn li min dikeve, paşê wî dikişîne dibe. Ez bi zaro me. Di van rojan de ezê biweldim. Ez te veşêrim bila ew xort te nebîne, ku te bibîne dê te bikuje, em pilanekî pêk bînin, piştî ku ez bizem em ji vir birevin.

Henîka Henaran kurapê xwe vedişêre.

Dibe êvar, xort tê, notla (weke) her rojê, dibore xaniyê xwe, Henîka Henaran di xaniyê xwe de disekine.

Wê şevê, Henîka Henaran diwêlîde kurekî tîne. Wî dişo, dipêçe, dike heleçanê. Ew bi xwe jî dikeve nav nivînên xwe. Mêrik tê hundir, diçe hêleşena qundaxê dinêre dibêje:

– Peh peh, te ji me re berxekî çi sipehî aniyê. Ew hema xercê ser pilavê ye, goştê wî çiqas xweş e. Ezê wî serjêkim, emê bixwin.

Henîka Henaran gava vê gotinê dibihîse, agir bi dilê wê dikeve. Dirlicife, serê xwe dizivîrîne. Dibêje:

– Evdê Xwedê, tu dê çawa qundaxa min ser jê bikî, ne ew mirov e, qet tiştê wisa dibe?

Mêrik qet medê xwe xerab nake, pêşve tê dibêje:

Ev berxa xwarinê ye, emê bixwin. Tu dê ji me re ji vir pey de gelek kurên mîna wî bînî... Berxê nêr ji bo kêrê ye. Tu qet xeman nekişîne.

– Qundaxê ji hêleşanê derdixê. Kêrê davêje stûyê wî, serjê dike. Wî hûr dike, dixê biroşê, dide ser êgir, diqijirîne, rûnê wî derdixê. Rûn dadirove feraqeke din. Birinc dide ser, pilavê çêdike. Henîka Henaran ji bin lihêfê wî raçav dike. Mêrik, pilavê xwe valayî firaqî dike, rûnê ku ji goştê qundaxê derxistibû berdide ser aliyekî pilavê, lê li ser aliyê din nake. Henîka Henaran ji vî dikeve şikê. Difikire ku di vî karî de tiştek heyê. Lê melheza xwe qet eşkere nake.

Mêrik goşt dixê feraqekî, pilavê jî dixê du feraqan, tasan datîne ser siniyekê, tîne dide ber Henîka Henaran. Dibêje:

– De rabe em bixwin. De kerem bike.

Henîka Henaran, serê xwe dikşîne bin lihêfê, dibêje:

– Ez çawa goştê qundaxê xwe bixwin. Qet ev yek dibe, tu bixwe.

Mêrik bi ser ve diçe, dibêje:

– Tu hema hopekî hilde bes e.

Henîka Henaran xwe hêrs dike dibêje:

– Evdê Xwedê, ez teze welidîm, destê min xwîn e, qirêj e, de wisa ne hinek av bîne ez destê xwe bişom.

Mêrik radibe, diçe avê bîne, Henîka Henaran firaqa ber xwe dizivîrîne aliyê wî. Ya aliyê wî jî, dizivîrîne aliyê xwe. Mêrik avê tîne, li destên wê dike, paşê dibêje:

– De bixwe, dest pê bike.

Henîka Henaran dibêje:

– Tu bixwe, ez jî, dê bixwim.

Mêrik dest davêje palzwê hopskî hildide, dibe devê xwe, gava ku hop dighêje ser lêvan, qirçînî lê dikeve dîteriqe. Di pey re holepîtek lê dikeve mêrik dişewite. Henîka Henaran, radibe ji wir direve. Lê çîkek ji mêrik dibijiqe ser alakê wê, destê wê jî, li terqandinê dişewite. Kurapê Henîka Henaran ji cihê ku xwe veşartibû derdikeve, tê cem wê. Her du bi aliyê meymûn ve direvin, ew jî dike hilke hilke, di cih de dikeve dîcehime. Mêrik, nav holepîtkê de dişewite, dibe zêr hildiweşe erdê. Henîka Henaran û kurapê wê xwe didin afîkî lê temaşe dikin. Daqeke zêrînî li alakê Henîka Henaran ketibû, destekî wê jî bibû zêr. Her du kilî-tên deriyan hildidin, yek û yek vedikin. Xanî gişk ji zêran dagirtî bûn. Ew gişk ji keçên bedew ên mîr, egît û giregiran ji rûnê zarokên ji tovê meymûn mabûn. Henîka Henaran bi kurapê xwe ve têt û tûrikên xwe dadigirin ji wir vedigerin nav êla xwe. Ji wan re salixên rewşa Henîka Henaran didin. Qewimandinên ku hatin serî wan dibêjin. Cihê xaniyê xwediyê meymûn ji wan re dibêjin:

– Herin li wir ji xwe re zêran û mal bînin. Bidin ser vê şiveriyê herin.

Mirovên êlê tev turên xwe digrin û dikevin rê. Ew diçin, lê rastî tu tiştekî nayên. Li wir besteke rast hebû, lê di bestê de tiştek nemabû. Ew vik û vala didin ser rê paşve dizivirin.

Mîrê êlê, Henîka Henaran bi kurapê wê re dizewicîne. Dîlan sê roj, sê şev dom dike. Henîka Henaran dibe jina kurapê xwe. Ew bi mirazê xwe şa dibin.

Çûk firî serê darê, em tev derketin biharê.

ŞANOYA

Jiyana Nû

Mirin û Jiyan

(Lîstik / Du Perde)

Hüseyin KAYTAN

Listikvan :

1- Topal Elî: 30 salî, bavê Zinar, mêrê Xecê. Mirovekî belengaz û jar. Çavbirçî û qurnaz.

2- Hemedê Kal: Bavê Xecê. Welatparêz û şervanekî kevin, mêrxas, egît û zana. 83 salî.

3- Zinar: Kurê Xecê û Topal Elî. 15 salî.

4- Dapîr: Jina Hemedê Kal. 80 salî.

5- Xecê: Jina Elî, keça Hemedê Kal, diya Zinar. Bi gerîla re têkiliyên wê hene. 25 salî.

6- Yuzbaşî Salih: Zabîtekî dagîrker.

7- Pala: Cerdevanek (Quricî)

8- Çawîş, gundiyên din.

Perdeya Yekemîn
Sahneya Yekemîn

Di înşaateke qereqolê de, çar-pênc gundî dixebitin. Topal Elî jî, di nav karkeran de cihê xwe girtiye. Lê baş naxebite. Çawîş, di destê wî de tîfing heyê, tê û diçe. Hemedê Kal, li pêşiya şanogehê (sehnê), li ser kevirê, li ba jina xwe rûniştîye; herdû bi hev re dipeyivin.

Mûzîk...

Zinar, bi lez û şahî tê şanogehê, dibeze, diçe cem kalê xwe...

Zinar : Kalo, kalo! Min kevir li serê leşkeran xist!

Hemedê Kal : (Şa dibe) Aferîn! Te baş kir. Te yekî di lêxista lawo...

Dapîr : Ji bo ku kaniyekê çêkin,

şik çêbibe. Gelek xweşik, gelek xweşik... Ha, ha, ha!...

Bêhdanekî kurt...

Dapîr : Vaye kûçikê mezin hat...

(Yuzbaşî tê)

Yuzbaşî Salih : Kar çawa dimeşe kurê min? Baş dixebitin, an na?



du kes nayên ba hev; lê gava ji bo karê Tirkan, hemû dibin şêr û piling...

Hemedê Kal : Gelek şidyayî dixebitin ev kole. Wê qereqoleke xwe-

Çawîş : Dixebitin qumandanê min!

Yuzbaşî Salih : Aferîn, aferîn! Em dê karibin êvarê hefteyî bidin wan? Te hesabê çêkir?

Çawîş : Em dê bidin wan, qumandanê min!

Yuzbaşî Salih : Aferîn! Em hinek pere bidin wan! Divê dewlet li hemwelatîyên (vatandaş) xwe xwedî derkeve. Dewlet mezin e! Eêê, ew jî hemwelatîyên baş in; ji bo ku gundê xwe li hemberî terofîstan biparêzin, ji dil û can dixebitin...

Tasek dew bîne em vexwin kurê min!

Çawîş : Ferman ya te ye, serserê min!

Dema Topal Elî vê gotinê dibihîse, ji cihê xwe radibe û bi dengê bilind, ber bi mala xwe ve dimeşe û gazî Xecê dike

Topal Elî : Xecê! Xecê! Qumandanê dew dixwaze!... Dew bîne! Bilezîne!

Xecê : (Ji dûr ve) Ziqum vexwin! Xulamtiya qumandan neke, were li dewarên xwe binêre! Binêre, bila şîr bidin ku ez jî dew çêbikim, paşê ji min dew bixwaze!

Topal Elî : (Hêrs dibe) Jiniik, min neyîne wê derê! Nexwe, ez dê te bavijime ber lingên xwe!

Bêhdaneke kurt... Yuzbaşî digere, li gundiyan karker mêze dike, paşê diçe ba Hemedê Kal. Bi tînazî dipirse:

Yuzbaşî Salih : Kalo!

Hemedê Kal : Hooo!

Yuzbaşî Salih : Tiraliya te dîsa li ser te ye! Qey tu di grevê de yî?

(*Hemedê Kal bersiv nade...*)

Yuzbaşî Salih : Ez ji te re dibêjim keftar! Te nebihîst?

Hemedê Kal : Min bihîst, qumandan, min bihîst...

Yuzbaşî Salih : Eêê?..

Hemedê Kal : Ez li ser tiştêkî difikirim, lê ditirsim ku bêjim.

Yuzbaşî Salih : Ka bêje, ka bêje!

Hemedê Kal : Na, na, tu dê hêrs bibî...

Yuzbaşî Salih : Ha, ha, ha! Ji ramana te tu kes hêrs nabe, kalo... Tu kî yî ku ez ji gotinên te hêrs bibim?...

Hemedê Kal : Tu zanî, yuzbaşî, tu çi yî?...

Yuzbaşî Salih : Pirsra te jî weke tirsra te vala ye, kalo. Ha, ha ha! Her kes dizane ku ez yuzbaşî me, yuzbaşiyê dewletê!

Hemedê Kal : Tu ne tenê yuzba-

be, lê bê îmkane, nabe... Ez her dem bixebitim, emrê xwe tev biqedînim, dîsa nikarim xaniyek bistînim û tê de rûnim.

Ez dixwazim vê bêjim: Ev karke-



şî yî, qumandan! Tu qomunîst î jî...

(*Yuzbaşî hinek hêrs dibe, lê eşkere nake*)

Yuzbaşî Salih : Çawa? Çima? Ha, ha, ha! Kalo, tu bi rastî jî aqlê xwe winda kiriye...

Hemedê Kal : Ka rûne qumandan, rûne ku ez ji te re metelokek bêjim.

Dapîr : Metelokên te jî qet xilas nabin. De here lo! Serê me bi metelokên xwe nexwe belayê! Hiş be!

Yuzbaşî Salih : Ka bila bêje, ka bêje! Metelok!

Hemedê Kal : Ka guh bide min ku, tu çawa qomunîst î, qumandan.. Ka guhê xwe baş bide min. Emrê min ji heştî derbas bû. Ez gelek jiyam, min gelek cih dît. Min bajarên mezin dîtî, min avahiyên mezin dîtî... Min bi karkerên din re xaniyên mezin çêkirin. Paşê ez fikirîm: em karker, bêyî tebat, bêyî rawestî, xanî, apartman û piran çêdikin. Min jî vê xebatê pere jî qezenc kir. Lê ev avahiyên ku me çêdikir, ji me re nebûn, tev ji xelkê re diman.

Ka carekî bifikire, qumandan: em çêdikin, lê ji xelkê re... Niha, ez dixwazim li bajêr xaniyekî min he-

rên ku li ser vê qereqolê dixebitin, dê karibin tê de rûnin, dê karibin tê de rûnin.

Eêê, ev jî, karê qomunîstan e. Ne wisa ye?

(*Gundiyan karker vedigerin lê mêze dikin. Bêdengiyê kurt...*)
Dûpişka ku bi xwe ve dide, te qet dîtîye, yuzbaşî?

Yuzbaşî Salih : (*Bi henekî*) Eêê... Bidomîne, bidomîne...

Hemedê Kal : Dema cih li dûpişkê teng dibe, bi xwe ve dide. Jahriya xwe berdide laşê xwe. Ev gundiyan ha jî, bi keda xwe, ji xwe re makîna mirinê çêdikin. Girtî, bivîrê cellêd tûj dike.

Yuzbaşî Salih : Ji min re peyvên wêjeyî (edebî) nebêje, kalo! Moda te derbas bû. Tu fêma nakî. Ez dewlet im. Binêr, ez dewletî me, dewlemend im. Lê tu? Tu eşqiyayekî kevn î. Ez, yuzbaşî me. Ji bo we li vir im. Ev qereqol, ji bo ku ji we re xizmetê bike, ji xelkê re xizmetê bike, tê ava kirin. Leşkerên Tirk ji bo we...

Hemedê Kal : (*Axaftina yuzbaşî dibire*) Xizmeta we, qumandan... Singuyên we, cemsyên we, tan-

qên we, topên we... Xizmeta we ya zilmê, xizmeta we ya kuştinê...

(Gundî dest ji xebatê berdidin, lê mêze û guhdarfî dikin.)

Destên xwe yên bi rûn li serê xwe bidin, qumandan... Di vê qereqolê de, ji vî gundî, gelo dê çend kes şikence bibîne? Dê laşê çend kesan derkeve? Bêje qumandan!...

Yuzbaşî Salih : (Bi hêrs ber bi gundiyan ve diçe û diqîre) Hûn ji bo çi disekinîn û difikirin? (Ber bi çawîş ve vedigere) Kê ji wan re got rawestin?

Çawîş : Ferman ya te ye, qumandanê min!

De bixebitin, nesekinîn!

Yuzbaşî Salih : Ne tenê emrê te, zimanê te jî, gelek dirêj e, keftar! Kalê heram! Ka bêje! Ez zimanê te, an emrê te kurt bikim?

Hemedê Kal : (Bi serbilindî) Hey qumandan, hey! Dar bi birinê ji holê ranabe, divê tu rih û hîmê wê jî bibirî. Tu darê bi hîmê wê ve jî bibirî, dîsa naqede; divê tu erd û axa wê bişewitînî. Bi şewitandina axê tenê dibe? Na, qumandan, divê tu baranê bibirî. Bi birîna baranê tenê nabê, hey qumandan, tu Xweda yî, yan şeytan î?

Yuzbaşî Salih : (Xwe bi xwe) Ez niha baş fêhm dikim ku kî qomunîst e? (Ber bi Hemedê Kal vedigere) Li min binêre kalo! Li min binêre, eşqiyayê kevnare. Destê dewletê ji hesinê ye, lê lepikê pembuyî wegirtiye. Miz dide, miz dide, miz dide... Lê ku bêhna wê teng bibe û lê bixê, kokê wê jî dimiçiqîne, barana wê jî dibire! Li dijî dewletê nepeyive!

Li vî çekî binêre, ev hêza di nav makîne de, hêza dewletê ye. Anku hêz û qeweta min e. Hêza dewletê, hêza min e. Yê ku dike, yê ku jîn jî dike, ez im. Ka li tiliya min ya şahadeyê binêre... Baş binêre, ku ez tiliya xwe milîmek bilîzînim, ji neviyê te re ne dar, ne baran, ne jî tav dimîne... Dibe an nabe? Heke ez bixwazim, karim li serê van çiyana giya-yeke candar nehêlim! Eger ez bixwazim, dewlet bixwaze, em karin

van deran li we bikin cihennem!

Hemedê Kal : (Kopalê xwe li erdê dixê û radibe ser piyan) Dawiya agirê xwefî ye, qumandan! Tu jî di nav vê cihenemê de yî!

Vê gotina min ji bîr neke, em hemû di nav vê cihenemê de ne. Em hemû! Lê hinek dixwazin bikin ci-



hennem, hinek jî dixwazin bikin cinnet! (vedigere, bi tiliya xwe ya şahadeyê yuzbaşî raber dike) Cihennem tu yî, tu cihenemî, qumandan! (Dimeşe ku ji şanogehê derkeve)

Yuzbaşî Salih : (Demaşa xwe dide ber serê Zinar) Di cihê xwe de bisekine, ne xwe ezê wî bikujim!

Hemedê Kal : (Vedigere) Wê tetikê bikişîne, qumandan! Tiliya xwe milîmek bilîzîne! (Dîsa vedigere û diqîre) Cihennem! Cihennem!

Dapîr : Ma tu dîn bûyî? Tu çi dibêjî? Tiştên ku tu dibêjî, guhê te dibihîsî?

Topal Elî : (Tê û li ber qumandan çok dide) Qurbana te me, qumandan efendî!... Ez ketime bextê te... Jixwe kurekî min heye, ji min re bibexşîne... Bide xatirê Xwedê... Kurê min nekuje...

Hemedê Kal : (Diqîre) Cihennem! Cihennem!

(Qîrîna Dapîr)

Topal Elî : Qumandan efendî! Ji bo Xwedê, tu bi bext î, qusura wî nenêre! Guh nede wî! Ew êdî kal

bûye, dîn bûye, kurê min bihêle, nekuje!

Hemedê Kal : (Tiliya xwe dirêjî Topal dike) Ka lê binêrin, ka lê binêrin, li wî jinemêrî binêrin! Binêrin ku çawa seyîtî dike... Seyê kedîkirî... (Ber bi qumandan ve vedigere) Ger tu wî tetikî nekişînî, ji te bê şe-

reftir kes nîne...

(Xecê, diya Zinar, tê ser şanogehê. Di destê wê de cêrek dew heye.)

Topal Elî : (Şa dibe) Dew, qumandan efendî, dew... Dew pir xweş e, dew...

Tu li ku mayî jinik? Qumandan ji tînbûnê mir. Min ji te re negot zû were? De bîne, de hadê...

(Diçe û dewî ji destê jina xwe digre.)

Xecê : Zinar! Were, Zinar!

(Zinar, radibe û direve himbêza diya xwe. Herdû ji şanogehê derdikevin. Yuzbaşî li piyan dimîne. Elî, dew digre û dibe pêşkêşî qumandan dike)

Topal Elî : Jina min dewekî xweş çêdike, qumandan efendî! Dewê me gelek xweş e. Kerem bike!...

(Yuzbaşî, tasek dew vedixwe û diqîre)

Yuzbaşî Salih : Çawîş!

Çawîş : Emir bike qumandanê min!

Yuzbaşî Salih : Divê kalo jî bixebite! Wisa dixuyê ku dê kalo jî, ji vê qereqolê fêde bibîne!

Çawîş : Li ser serê min, qumandanê min!

Topal Elî : Hûn li çi dinêrin! Bihna qumandan efendî teng nekin! De bixebitin, bixebitin.

Çawîş : De kalo! Balyozê bigre, dest bi xebatê bike!

Hemedê Kal : (Bi hêrs, balyozê



ji destên çawîş digre û li dîwarê qereqolê dixê û diqîre) Cihennem! Cihennem!

(Yuzbaşî demança xwe dikişîne)

Yuzbaşî Salih : Kalê qomunîst!

(Yuzbaşî, Hemedê Kal dîkuje. Qîrîna Dapîr. Yuzbaşî û çawîş, ji sahnê derdikevin. Sahne nîvetarî dibe. Gundiyên karker, dest ji xebatê berdidin. Topal Elî, di quncikekî dîwê de xwe quloz dike, wisa dimîne. Xecê, Zinar û hinek mirovên din tîna sahnê. Koro aryayek dixwîne.)

Xwîna gayê reş
Zêdahî dide erdê
Di xwîna gayê reş de
Dexlê me geş dibe

Balyoza wî giran û mêr
Tevlî axê dibe canê wî

Milên wî cihê benderê

Nîrê wî pûç dikin
Di çavên wî yên mezin de roj
Di qîrîna wî ya reş de gêz

Cotê wî giran û mêr
Tevlî axê dibe canê wî

Em dipesinin gayê mêr
Di binê roj û hîvê de
Ji bo ceh û garisê

Ji bo zivistana reş a mezin

Xişma wî mezin û mêr
Tevlî axê dibe canê wî

(Lîstikvan tev, laşê Hemedê Kal hildidin û ji sahnê derdikevin. Topal Elî, tenê bi serê xwe, li sahnê dimîne. Sahne hêdî hêdî tarî dibe.)

Perdeya Yekemîn Sahneya Diwemîn

(Dapîr, li mala Topal Elî, di odayekê de, li ser laşê Hemedê Kal, kilamek li ser mêrê xwe dibêje û bi dengê nizm û tenik digirî. Xecê, rûyê Hemedê Kal dişo. Zinar, li paş li ber dîwar li ser piyan radiweste û diponije. Ji dûr ve, stranek tê bihîstin:

ax, ax rind e, egîtê min,
ax, ax xweş e
di bin çizmên dagîrkeran de,
bavê min,

roja welêt tarî ye
wek şeveke reş e
de rabe, egîtê min,
rextê xwe girêde,
tîvinga xwe hilde ser milê xwe
bi birîna xwe ya mirinê,
ber bi çiyana ve bimeşe
ax, ax rind e, mêrxasê min,
ax, ax xweş e...

Xecê : Rûyê wî paqij bû. Rûyekî xweşik, rewşen... Hîna wekî zarokê ye.

Ew 83 sal jiya. 83 sal çek wer-girt, zeviyan çand û çinî, bajaran geriya... Mîh û bizinan xwedî kirin. Hespên rind û mezin xwedî kirin. Piştî 83 salan, li piyan hat kuştin. Mirineke rind heqê wî bû. Li piyan mir, serê wî çikiyayî bû, eniya wî vekirî û ronî bû.

(Paş ve diçe û bi axînek li rûyê bavê xwe mêze dike.) Belê... Rind çêbû... (Vedigere Zinêr) Ne wisa ye, Zinar?

(Zinar naxive. Xecê radibe ser piyên xwe.) Zinar, Zinar... Were vir, kurê min; êdî divê ku tu ji miriyan netirsî, bexê min, êdî tu mezin bûyî, divê tu ji miriyan netirsî.

(Bêhdaneke kurt)

Ji mirinê netirse, Zinar...

Zinar : (Bi serbilindî) Ez natirsim!

Xecê : Ka lê binêre, ka lê binêre, çiqas xweşik radizê. Rûyê wî gelek geş e, ne wisa ye, Zinar? Rûyê wî pir geş e...

(Xecê, xebata xwe ya şuştinê diqedîne û tiştên xwe ber hev dike.)

Bavê te mirovekî pir tirsonek e, Zinar. Ji mirovên dewlemend û bihêz re koleştî dike. Tu mîna wî nînî. Divê tu wek bapîrê xwe bî. Ew mirovekî pir egît bû.

(Xecê pariyek difikire û diçe devê sandoqekê vedike.) Were Zinar! Divê tu heyf û tola bavê xwe hiîni. Ewda bapîrê xwe bistîne, Zinar!

(Xecê, axînek dikişîne û bi herdu destên xwe serê xwe digre.)

Di serê min de hiş nema. Tîfinga wî niha di bin axê de ye. Veşartibû. Ez dê wê derxim û bidim te. Divê

êdî çek neyên veşartin. Divê êdî çek neyên veşartin. Mêr, bêyî çek nabe.

(*Ji sandoqê xencerek derdixe.*)

Ev xencera ha gelekî kevn e. Xencereke rind e. Xencereke pir rind e, belê...

(*Bêhdanek*)

Zinar : Gava ez mezin bibim, ez jî dixwazim bimirim. Ez dixwazim wek bapîrê xwe bimirim.

(*Xecê, dîtirse, dicemide û dîfikire.*)

Xecê : Here hinek dar bîne bavêje tîfikê (ocaxê), Zinar. Hewa gelekî sar e...

(*Zinar derdikeve derve.*)

Topal Elî û qumandan tên hundir. Dapîr bi hêrs radibe, diqîre û digirî.

Topal Elî : Hûn çi vedixwin, qumandan efendî? Çay an qehwe?

Yuzbaşî S. : Gelek sax be, kurê min... Ez dê niha biçim. Lê divê em vê gelemşeyê

de dew û doza xwînê nemîne. Mirovê mêr dikuje jî, tê kuştin jî, çi ye yanî...

Zinar, di himbêza wî de dar, tê sahnê.

Xecê : Bîne kurê min...

Yuzbaşî Salih : (*Axaftina xwe didomîne*) Zaroyê xwe ji vê sefaletê derxe. Kurê xwe bide ber xwendinê, bila bibe mirovekî mezin. Bila wek bapîrê xwe negevize, perîşan nebe.

Sîlehê te heye?

Topal Elî : (*Bi tirs*) Welleh, bil-

(*Bêhdanek... Sahne dest bi tarîbûnê dike.*)

Zinar : Dayê! Bapîrê min sîlehê xwe li ku veşartibû?

Xecê : Te çi got?

Zinar : Bapîrê min çekê xwe li ku veşartibû?

Xecê : (*Diponije*) Bisekine lawê min, bisekine. Lez neke berxê min, lez neke. Wê ew roj jî bîn, Zinar; dê ev roja tolehildanê jî bê...

(*Tarî...*)

(*Demek şûnda, derî tê lêdan*)

Xecê : Hûn kî ne?

(*Bêdengî*)

Xecê : Ew kî ye?

Gerîla :

Em in, yadê; heval in.

(*Çar gerîla tên hundir. Piştî demek, gerilayek dest bi axaftinê dike*)

Gerîla : Elbet em dê bimirin, dayê. Hemedê Kal hîna nehatibû kuştin, qîriya-



(problemê) çareser bikin.

Topal Elî : Kerem bike qumandan efendî!

Yuzbaşî S. : Em vê meselê di navbera xwe de çareser bikin. Weke mêran! Bila tu kes tevî vî karî nebe! Te fêmkir?

Topal Elî : Min baş fêmkir, efendî...

Yuzbaşî Salih : Dê sibehê savcî were.

Topal Elî : Deriyê me her dem ji dewleta me re vekirî ye, efendî.

Yuzbaşî Salih : Aferîn, kurê min, aferîn. Ez ji te pir hez dikim. Tu dewletê diparêzî. Em bi te re dê gelek tiştên baş çêbikin.

Topal Elî : Tu ferman bide bes e, qumandan efendî.

Yuzbaşî Salih : Ez dê bedela xwîna we bidim. Bila di navbera me

leh tune qumandan efendî. Ji xwe...

Yuzbaşî Salih : Netirse kurê min, jî min netirse. Em êdî dostê hev in. Eger sîlehê te tune, em sîlehê bidin te. Him jî, ji yê rintirîn. Em dikarin cebixane bidin te. Mêrkuj heye, terorîst heye, ne wisa ye?

Topal Elî : Canê te sax be, qumandan efendî! Dewleta me sax be!

Yuzbaşî Salih : Sibehê were konê min. Dê savcî beg jî were. Min ji muxtar re jî got, bila savcî beg bibe mêvanê me. Sibehê zû miriyê xwe rakin. Bila nemîne germayiyê. Bîhn dide...

Topal Elî : Ji xwe zaf pîr bû, qumandan efendî. Ew dê ji xwe bimra...

Yuzbaşî Salih : De kurê min, serê we xweş be. Ez diherim.

bû û gotibû "cihenem"! Ev gotineke beredayî nîne. Kurdistanê kirine wek cihenemê. Hîn jî dikin. Ew zilmê dikin û dikujin. Ew mirin û nemayî ne. Em jî, jîn û heyat in. Belê, Kurdistan dê bibe cihenemeke mezin, lê ne ji bo me, ji bo dijmin. Lê di dawiyê de, wê bibe bihişt (cînet). Yê ku wê bikin cînet em in. Em dê şer bikin. Em dê tola Hemedê Kal hilfin. Ev doz, dozeke mezin e. Em dê heyfa şehîdên Kurdistanê tev bistînin. Ew û heyfa wan, Kurdistanê azad e. Kurdistanê azad, serbixwe û yekbûyî.

De rabin, em dê şehîdê xwe, bi awayekî baş û bi serfirazî bidin axê.

(*Laşê Hemedê Kal hildidin û derdikevin derve.*)

=====**dumahîk heye**=====

tew tew dînê

Cemîla CELÎL

Allegro

Ez ne dînim, te ez dîn ki_rim, hay-la dî_nê,
Ez ne dî_nim, te ez dîn ki_rim, t'ew, t'ew, dî_nê.

Ez ne dîn im, te ez dîn kirim, hay-la dînê
Ez ne dîn im, te ez dîn kirim, tew, tew, dînê.
Çol û peseran wergirin, hay-la dînê
Ez gunî bûm kedî kirim, tew, tew dînê.

Konê bavê te giran e, hay-la dînê,
Şêniya bavê te giran e, tew, tew dînê
Barkirî ga û garan e, hay-la dînê
Tirsa min ji Roma giran e, tew, tew, dînê.

Konê bavê te hindik e, hay-la dînê,
Şêniya bavê te hindik e, tew, tew, dînê.
Barkirî ga û golik e, hay-la dînê
Tirsa min ji Roma hindik e, tew, tew, dînê.

Vî Feratî nale-nal e, hay-la dînê,
Vî agirî nale-nal e, tew, tew, dînê.
Ber xwe anî koç û qal e, hay-la dînê
Memkê dîna min sêvê tel e, tew, tew, dînê.

Vî Feratî xuşe-xuş e, hay-la dînê,
Vî agirî xuşe-xuş e, tew, tew, dînê.
Ber xwe anî qal û qirş e, hay-la dînê
Memkê dîna min sêvê tirş e, tew, tew, dînê.

navên bajar, bajarok û gundên Kurdistana Bakûr

Xwendevanên delal, ji vir pey de, em dixwazim ku navên bajar, bajarok û gundên Kurdistanê yên ku ji aliyê dewleta Tirk a dagîrker ve hatine guhertin, biweşînin.

Xwendevanên me yên delal, daxwaza me ji we ev e : Heke di destê we de, di vî warî de xebatek heye, ji me re bişînin; heke tune, lê bigerin navê bajarok û gundan fêr bibin û dîsa ji me re bişînin.

Bedlîs - Navend

(Gundên ku bi navenda bajêr ve girêdayî ne)

Çûkûş	: Tabanözû
Qerebo	: Aşağıkarabağ
Xiloling	: Kömüryakan
Ximçûr	: Tatlıkaynak
êlnêp	: Çalidüzü
Kamax	: Dörtağaç
Kerp	: Konuksayar
Merkok	: İçmeli
Papşên	: Yumurtatepe
Perxend	: Kireçtaşı
Samo	: Yaygın

Çilxûr = Çukur

Norşên	: Güroymak
Morxa Jêr	: Aşağı Kolbaşı
Balekan	: Yemişveren
Bizatûn	: Kavunlu
Boryan	: Oduncular
Çapkîs	: Üzümlüveren
Çitak	: Çitak
Serê Golê	: Gölbaşı
Xesq	: Kuştası
Kisxan	: Arpacık

Kotnî	: Gürkırı
Mişaxşên	: Değirmenköy
Mişkan	: Kaleli
Mazek	: Sütderesi
Misûrî	: Kekliktepe
Nîst	: Yazıkonak
Pav	: Yamaçköy
Pavik	: Cevizyatağı
Pêrtûk	: Çallı
Sêz	: Bölmedere
Sifit	: Saklı
Şêxan	: Çayovası
Taxtelû	: Tahtalı
Morxa Jor	: Yukarı Kolbaşı

Sîmek = Doğruyol

Hêvrês	: Bölük yazı
Eleq	: Bayramalan
Arpêt	: Kokarsu
Oleka Jêr	: Aşağıölek
Germav	: Ilıcak
Xumaç	: İçgeçit
Hora Kurdan	: Yukarı Balcılar
Hora Şêxan	: Aşağı Balcılar
Helhak	: Boztepe
Kiştonîk	: Yolalan
Qultîk	: Arıdağ
Korcan	: Akçalı
Kut / Kût	: Konaç
Mexribyan	: Keklikdüzü
Paxs	: Üçkardeş
Pâpiznêx	: Başmaklı
Sanis	: Geçitbaşı
Wanik	: Dereağzı
Vêrvan	: Yolcular
Oleka Jor	: Yukarıölek
Alokan	
Arziving	
Kulibîk	

Wanex
Pêrtaz
Avaçeman
Qaripat
Qerqoş
Şêxciman
Şênê

Şetek = Ortakapı

Dûxan	: Sarıkonak
Çemana Jêr	: Aşağıçeman
Baykişen	: Beşkaynak
Bocan	: Yeşilsirt
Xaçûkan	: Ağaçdere
Hewênis	: Esenburun
Herde	: Çobansuyu
Hersot	: Kınalı
Hevek	: Cevizdalı
Hormiz	: Ağaçköprü
Qonaxdere	: Karınca
Kermete	: Yarönü
Leylekan	: Uçankuş
Lêrd	: Kayalıbağ
Sap	: Dikme
Sîzan	: Düşkaya
Sivar	: Konalga
Şêxciman	: Çeltikli
Tuyê	: Direktaş
Yeço	: Ünalı
Çemana Jor	: Yukarı Çeman

Qesrik = Narlıdere

Îngol	: Ağaçpınar
Miryanis	: Ayrancılar
Riclek	: Tanrıyar
Sîzan	: Sarpkaya
Tiphî	: Karbastı

Bedlîs / Elcewaz
(Bitlis / Adilcewaz)

Sîpana Jêr	: Aşağı Süphan
Cangiran	: Cihangir
Xaskundûrûk	: Bahçedere
Kuçerî	: Erikbağı
Kazuxan	: Yolçatı
Murxus	: İpekçayır
Nurşêncix	: Harmantepe
Wêranqaz	: Çanakyayla
Sîpana Jor	: Yukarı Süphan
Mustafa	: Yıldız

Arın = Göldüzü

Akçira	: Karşı
Ariçkûs	: Kavuştuk
Xirabesork	: Örentaş
Hêkesor	: Gümüşdöven
Horans	: Karşiyaka
Qerekeşîş	: Yarımada köyü
Qereşêx	: Karaşeyh
Kazik	: Aydınlar
Melefadil	: Mollafadil
Norşên	: Heybeli
Parxat	: Esenkıyı
Pêşnekomir	: Kömür
Dêrê	
Kanzak	

Bedlîs / Xelat
(Bitlis / Ahlat)

Hêrsong	: Yuvadami
Xasûk	: Kırkdönüm
Hinin	: Çatalağzı
Karmûç	: Yeniköprü
Qûşxane	
Sifresor	: Kınalıkoç
Suxurt	: Serinbayır
Sorê	: Uludere
Têxût	: Taşharman
Zaxik	: Seyrantepe

Pirxûs : **Ovakişlı**

Axçewêran	: Akça Ören
Birik	: Gedikpınar
Cizîrok	: Dilburnu
Develik	
Xanik	: Çukurtarla
Xiyartang	: Gölgören

Xanik	: Otluyazı
Kêrs	: Kırıkkaya
Kuştiyan	: Alakır
Mêzik	: Burcukaya
Nazûk	: Nazik
Tepewang	: Güzelsu
Viştung	

Bedlîs / Xizan
(Bitlis - Hizan)

Ataran	: Kapısuyu
Azgûr	: Yığınkaya
Best	: Oymapınar
Gulpîk	: Süttaş
Xeyda	: Sırmaçek
Xelepor	: Yolbilen
Hirît	: Çökekyazı
Xoros	: Horozdere
êz	: İçlikaval
Kilîbyan	: Budaklı
Mezrewerebîn	: Karlitepe
Patyar	: Koçlu
Prûnis	: Gökçimen
Selih	: Güreçe
Şên	: Aladana
Kûlat	: Gökay

Xakêf = Hakîf

Şêrêz	: Akşar
Bûsakan	: Ağılözü
Hêşet	: Kolludere
Os	: Kayadeler
Ûrûn	: Eren
Ûçum	: Sürücüler
Simas	: Sağınlı
Çirçax	: Kalkanlı
Gêrvês	: Ekintepe
Nûrs	: Kepirli
Ûbîn	: Döküktaş
Pisyar	: Harmandöven
Reşan	: Sağırkaya
Şêrnîs	: Sarpkaya
Giran	: Ballı

Bedlis / Mutkî

Avetax	: Taşlıpınar
Batılmış	: Akıncı
Çeman	: Çaygeçit
Xaştax	: Çatalsöğüt
Mizûk	: Dereyolu
Nizin	: Yenibağ

Seransor	: Alatoprak
Tetwan	: Sekiliyazı
Tax	: Yumrumeşe
Aspincêr	: Üstyayla
Mezrê	
Birkux	

Xwêt = Huyut

Tap	: Kavakbaşı
Gûzik	: Kocalniş
Hawark	: Erler
Kizank	: İkişler
Kor	: Çığır
Korsvak	: Yenidoğan
Parsing	: Boğazönü
Pixung	: Araplıseki
Taxwang	: Uran
Oxîn	: Yukarıkoyunlu
Taxîsor	: Çitliyol
Tixp	
Xaçinan	
Sixirs	
Pixung	
Pîrîvan	
Gudîşkan	
Qulayî	
Waran	
Serkovî	
Pilçuk	
Şinist	
Şamyan	
Ginut	
Mezra Eladin	
Arînok	
Mehbûban	
Sinişta Sêdû	
Birkux	

Kolanis = Geyikpınar

Horsênk	: Kayran
Hixik	: Çiğdemalan
Kosak	: Koşak
Qeyseran	: Tolgalı
Kurtiyan	: Kapıkaya
Tarh	: Yuvalıdam

Meydan = Meydan

Herpus	: Taşboğaz
Îrangotî	: Kovanlı
Keybûran	: Gümüşkanat
Kinzo	: Salman
Kuran	: Uzunyar

Merment	: Bağarası
Misî	: Açıklan
Niç	: Çatalerik
Şên	: Kaşıklı
Tirkanat	: Üçadım
Gîsk	
Nuxab	
Şênik	
Kaşax	
Piritûk	
Oxsa	
Kerxo	
Silind	
Çeman	
Mîsor	
Nixûn	

Bedîs / Tatwan

Edebax	: Adabağ
êleman	: Örenlik
Çilxor	: Benekli
Engesor	: Dalga
Xaxrêf	: Küllüce
Kizwak	: Kıydüzü
Zixak	: Sarıkum
Şêxmîran	: Şemiran

Kotom - Küçüksu

Balekan	: Çalidüzü
Ent	: Eğritaş
êz	: Çevre
Qemer	: Obuz
Kurtikan	: Tokaçlı
Nêl	: Koyunpınarı
Sak	: Kırkbulak
Sûlû	: Dibekli
Şikranis	: Yoncabaşı
Paşwask	
Xiyartank	
Sapor	

Reşadiye

Sorp	: Yelkenli
Axusto	: Köprücek
Aşnak	: Budaklı
Çangis	: Dönertaş
Çorsên	: Düzcealan
Xerzît	: Koyluca
Axkisa golê	: Göllü
Hacıyan	: Suboyu

Engesora Hebeyan	: Gürtepe
Kancas	: Sollica
Kûta kisanê	: Sarıdal
Kina Sor	: Yediveren
Komiş	: Çanakdüzü
Kirtvan	: Çavuşlar
Ovans	: Kuruyaka
Orans	: Anadere
Bêluh	: Alacabük
Poxe	: Tosunlu
Pirûs	: Koruklu
Siyamîrf	: Kısıklı
Şahmanîs	: Bololan
Avetax	
Kûta Uransê	: Pertevkût
Ariskox	
Por	
Hurûntûs	
Xaxus	
Wanika deştê	
Pûrkanis	
Pax	
Pindvanis	
Exdat	
Şirînşas	
Kendivê	
Birakom	
Ximis	
Kindirans	
Miroş	
Televêr	
Hirnik	
Engesora Uransê	
Panças	
Înzan	
Birîkar	
Vartinis	
Xeynat	
Zulûl	
Alan	
Askirî	
Kerp	
Andewîn	
Kiryaç	
Çûwar	
Salês	
Alekan	
Çemê xanê	
Pêrtek	
Wenika kavarê	
Axkûsa Kavarê	
Canas	
Dergeh	
Zap	

Şehîdên Nemir

Sala nod û didowan
serhildana Kurdan
xewa dijmin direve
ji ber êrîşên merdan
geş bû şerê xweşmêran
li her derf wek şêran
ji bona azadiyê
malû canê xwe berdane

Egîd û şêrên çîyan
bûn rehberê gundiyan
berê wan dane dozê
da xilasbin ji qeydan
Doza kawayê hemdem
da lê xwedî bibin em
wan dara azadiyê
bi xwîna canê xwe avda

Qada herçar hevalan
li her dem û sersalan
dijî li dilê xortan
dilê zana û xwenda
da ku dara wa çandî
ew gula wan hebandî
dî dilê xwe de şîn kin
tu baroz neyên serda
Wekî zekya Amedî
li doza wan bû xwedî
bi destê xwe bilind kir
Alaya ser bilinda

Rehşan bû wek stêrkan
dil paqijîr ji zêran
dikir gazî şiyarbin
dî nav pêta agir da
Dî rêça wan de bê jmar
ji qîz û xortan hezar
wek Zînet û Ceyhanê
şehîd bûn di wê rê da

şehîd lew bê jmar in
sed rehmet bibar liwan
nîşana azadî ne
pîroz in li hemî erda
bîst yek ta bîst û heştan
kom bin li çîyan û deş-
tan

bi şahî û bi şîn bin
ji bo karwanê şehîdan
her der şîn be dara me
pîroz be sersala me
gulên kesk û sor û zer
şîn bin li bajar û gundan
Bêkon Pojan jar û sist
ji kovanan wiha rist
ji ber jana serê xwe
ji can dil keser da.

Bêkon POJAN

NAMEYÊN XWENDEVANAN NAMEYÊN XWENDEVANAN

Sayın Mezopotamya Kültür Merkezi Yönetici ve Çalışanları,

Öncelikle sizlere sevgi, saygı ve güzel uğraşlarınızda başarı dileklerimizi iletiyor, en içten duygularla kucaklıyoruz.

Halkımızın kültürel sanatsal güzelliklerinin açığa çıkarılmasının tarihsel anlam ve öneminin, gelişen özgürlük yürüyüşü bağlamında yarattığı-yaratacağı etkinin boyutu, ortaya çıkarılan değerler üzerinde boy verip geliştirecek yaratıcılıklarla daha da gelişip, güçlü gerçekliği ifade edecektir.

Halkımızın öncüsü rehberliğinde ayağa kalkarak güçlü adımlarla destansı yürüyüşünü yaratması ve keşintisizleştirilmesi, kültür-sanat alanında görkemli olanaklar sunmaktadır. Biraz çaba, biraz kararlılık, yaratıcılığın kendisi olacaktır. Bu konuda çabalarınızın temel bir işlev üstlendiği gerçekliği, sizlere daha fazla fedakarlığı, coşkuyu, özveriyi getirdiğini biliyor, bu çabalarınızla manevi birliktelik içinde olduğumuzu belirtmek istiyoruz. Ancak manevi birliktelik yetmiyor ve bu konuda bizlere de büyük görev ve sorumluluklar düştüğünü de biliyoruz. Çabalarımızın manevi desteği aşması konusu temelinde olması gerektiği gerçeği, bizlere de kendimizi aşmayı dayatıyor.

İçinde bulunduğumuz özgül koşulların daraltıcı ve sınırlandırıcı olduğu da biliniyor. Fakat özgül koşullar çerçevesinde yapılması gerekenleri kazanıma ve ürüne dönüştürmek, buradaki darlıkları biraz aşmaktan geçiyor. Beyaz terörün kişiliklerde yarattığı tahribatın kültürel boyutu, yığınla ihtiyacı da doğuruyor. Bu, salt düşünsel alanla aşılmakla sınırlı değildir, bu yetmiyor. Pratik ger-

çeklik, düşünsel alanda güçlenmenin de teminatı oluyor.

Buradaki kültürel sanatsal çalışmalarımız kapsamında ihtiyaç duyduğumuz kitaplar var. (*) Bu konuda yardımcı olmanızı istiyor, bekliyoruz. Ve şimdiden teşekkürlerimizi iletiyoruz. Ayrıca sizden bir başka istemimiz, bloğumuza gelmeyen ve ihtiyacını duyduğumuz REWŞEN'in bize de gönderilmesidir.

Başarılar...

Mehmet DOYMAZ
E Tipi Cezaevi, 9-13 Koğuş
AYDIN

Xebatkarên Hêja,

Li ser alfaba Kurdî gelek nivîsar û name di kovara Rewşen'ê de hatin weşandin.

Makînen nûjen ên nivîsan wek komputer (bilgisayar) telefax û hwd. bi kîjan tîpan dinivîsan, ji tîpên elfaba me kîjan tîp di vê standardbûnê de cih nagrin, divê em çawa vê pirsgirêkê çareser bikin û bibin xwedî alfabeke bê kemasî. Em heta bersiva vê pirsê bi awayekî zanistî di ronahiya zmanasiya nûjen de nedin, em nikarin xwe ji guftûgoyên li ser elfaba me ku dewam dikin, xelas bikin. Ez di nivîsara xwe de dixwazim dîtin û ramanên xwe yên li ser elfaba Kurdî ya bê kêmasî û bi tîpên standard pêşkeşî we bikim.

1- Pirsgirêka dengên di nav tîpên ç k p t de veşartî:

Dengên ç k p t yên "hişk" dengên bingehîn ên Kurdî ne. Girîngiya bingehiya wan ji hoyê (şertê) wate guhertinê tê. Her dengê di zimên de nabe dengê bingeh-

(*) Değerli Okurlar;

Cezaevlerinden kitap talebi gibi haklı istekler sık sık Kültür Merkezi'ne iletilmesine rağmen, ne yazık ki, mali ve personel güçlükler içinde bulunan merkezimizin bunları karşılaması mümkün olmamaktadır. Aşağıdaki liste, yukarıda adresi yazılı Mehmet Doymaz tarafından blok adına istenmiştir. Elinde olan ya da imkanı olan okurlarımızın ilgisine sunuyoruz:

1. Kürtçe-Türkçe/Kürtçe Fransızca/Kürtçe-İngilizce Sözlük (Sosyal Yayınları)
2. Kürtçe Grameri, Emir Celadet Bedirxan (Doz Yayınları)
3. Kürtçe-Türkçe Sözlük, J. Blau (Sosyal Yayınları)
4. Gramera Zimanê Kurdî, Qanatê Kurdo (Doz Yayınları)
5. Ferheng, D. Îzofî (Deng Yayınları)
6. Kürtçe Dilbilgisi, A. Balî (Alan Yayınları)
7. Kîne Em?, Cegerxwîn, (Med Yayınları)
8. Şefeqa Lenîn, Cegerxwîn, (Med Yayınları)
9. Dîroka Kurd û Kurdistanê, A. Tîgrîs-A. S. Germiyani (Doz Yayınları)
10. Gotnê Pêşya Kurda, H. Deniz (Kaynak Yayınları)
11. Hevisîna Rêzimanê Kurdî 1-2, F. Huseyn Sagnîç, (Melsa Yayınları)
12. Kürtçe-Türkçe Sözlük, A. Dicle

hîn. Di Kurdî de jî wekî hemî zimanên din, dengên ku bingehînin nînin hene. Divê em xwestina Osman Sebrî bi cih bînin. Bi **ç k p t** yên hişk, an jî yên nerm, kîjan hindiktirîn in divê em wan "kh, ch, ph, th" binivîsin. Wekî di encam û lêkolîna nivîsara S. Rêving' de tê gotin "k" yên adetî an jî yên nerm ji yên hişk kêmtir in.

Bi dîtina min ne tenê "k" yên adetî "ç, p, t" yên adetî jî ji yên hişk kêmtirin. Kurdên Sovyetê hîna jî, "ç, k, p, t" yên adetî an jî yên nerm bi tîpên "ç, k, p, t" dinivîsin.

2- Pirsgrêka tîpên alfaba Kurdî yên ku standart nînin.

Ji tîpên alfaba me sê dengdêr "ê, û, î" û du bêdeng (dengdar) "ç, ş" standart nînin. Ev tîp bi makînen nûjen ên wek komputer û hwd. nayên nivîsandin. Bi vê rewşa xwe asteng û diwariyan derdixînin pêşiya me. Eger em xwe ji alfabetîzebûna Tirkî û hîkariya alfabetîzebûna Tirkî xelas nekin, em jî mîna Tirkan nikarin xwe ji çewt nivîsandinê xelas bikin. Ji ber ku îro êdî hemî makînen nivîsan yên nûjen bi tîpên standart amade dibin.

Divê em van tîpên nestandard bi dîftongan re biguherînin. Heta niha min dixwest ku em dengê "ê" bi tîpa "ê" ya Fransîzî binivîsin. Lê ez dinêrim Fransîz jî dixwazin wan tîpên xwe yên standart nînin bavêjin, di şûra wan de tîpên standart bikarbînin.

Alfabeke bi tîpên standart bê dîftong amade nabe. Hejmara dîftongên zimanên Ewropî yên me zedetir in. Dîsa jî di hînbûna zmanê xwe de rastî diwariyan nayên.

A- Tîpên alfaba Kurdî 26 in.

1- Tîpên gir: A B C D E F G H I J K L M N O P Q R S T U V W X Y Z.

B- Dîftongên alfaba Kurdî 8 in: CH, KH, OU, PH, SH, TH, UE, XW

Rojhat AZADÎ

Birayên hêja yên kovara Rewşenê,

Piştî gelek silavan, ez şadî û serketina we ji bo xizmeta ziman, ferheng û çanda Kurdî ji yezdanê mezin dixwazim.

Dostên delal, birayên Rewşen, ez navnîşana xwe ji we re dinivîsim, ku hûn ji min ra kovara Rewşenê û rojnameyên Kurdî bişênin. Her wisa ez dê ji we ra kovar, pirtûkên Kurdî û gotar bişênim. Ez bi Kurdiya Soranî dikarim binivîsim

Dostên delal, gava ev nama min gihîşte destê we ji min ra xeber bişînin ku ji we ra gotar bişênim, lewra nizanîm gelo ev name gihîşte destê we, ya na? Her wisa ji we re kîjan cûre kitêb û pirtûkên Kurdî yan Farisî lazîm in û hûn çî dixwazin, ji min ra binivîsin.

Ehmed ŞERÎFÎ
Mehabad
Kurdistana Rojhilat

Değerli Rewşen Çalışanları,

Welat gazetesinin 33, sayısındaki bir haberde bir alfabeye komisyonunun kurulduğunu ilgilyle okudum.

Kürtçe, uzun bir zaman dilimi içinde ağır asimilasyonist baskılara maruz kalmasına rağmen, güçlü yapısı sayesinde yazılı alan, konuşma alanına göre "bakir" kalabilmiştir. Yazılı alanın tersine, ulus bireyleri arasındaki sözlü iletişim bozulmuş ve bireyler yazılı tekstlere yabancılaşmıştır.

Bu olumsuz süreci tersine çevirmenin ve bu bozuk sözlü iletişimi restore etmenin ilk adımı yazılı basını "konuşmak" ve geniş kitlelere ulaştırmanın etkin yöntemlerini keşfetmektir.

Bence alfabe oluştururken insanların fiziksel, psikolojik zaaf ve yeteneklerini kaale almak lazım. Ben alfabe için trafik işaretlerine benzetirim. Yani karakterler dikkat çekmeli, okuma akışını kesmemeli ve ilk bakışta algılanmalıdır. İyi bir alfabe hem bilgisayar uyumlu hem de ergonomik olmalıdır.

Sonuç olarak alfabe komisyonunun kurulması kararını çok olumlu bir adım olarak değerlendirmek gerekir. Ancak bu komisyon siyasetler üstü ve tüm ulus için bağlayıcı olmalı. Bunun için herkese çağrı yapılmalı ve herkesin görüşü alınmalıdır. Ancak bu şekilde bu alfabe karışıklığına so verebiliriz.

Kardeşlerim, bu ağır koşullar altında göstermiş olduğunuz olağanüstü çabalarınızı hisetmemek imkansız. Hepinize başarılar diler, en içten selamlarımı sunarım.

N.ERPOLAT

Serketin Nêzik e

Serketin nêzik e
bi livbaziye gerîla
hildiweşe sengerê neyar.
dikeve dest, bost bi bost
axa welat.

Serketin nêzik e
guh bide û lê binêre.
dayîk nagirîn, zarok naqîjin.
êrîş dibin ser dijmin
bê perwa.

Serketin nêzik e
beramberê mirin, jîyan
beramberê dîî, azadî,
hêvîdar e ji rizgariyê, dimeşe.
gelê MEDYA

Ber bi serketinê ve.

Mamosteyê DILXWAZ
FARQÎN

F E R H E N G O K

agirkuj	: ateş söndürücü	koçi	: hicrî
alif	: hayvan yemi	lê (li + wî-wê) çûn	: ona çekmek, ona benzemek
avbend	: baraj	minak	: örnek
avdang	: kova	nadîde	: ender görülen
avdev	: salya	nifş	: nesil
avjen	: tulumba	nivîn	: uyumak
bajarok	: kasaba	payîn	: gözetmek, beklemek
bêjekar	: konuşmacı	pepûla	: kelebek
biwêj	: terim	perperok	: kelebek
bîrdozî	: ideoloji	peyam	: haber
bîstek	: bir an, bir lahza	pêk anîn	: yerine getirmek
çalak	: faal	pûyîn	: serpilmek
çik	: dik	qerewîl	: nöbet
çikandin	: dikmek, dik koymak	qûşxane	: tencere
dilmanî	: küskünlük, hoşnutsuzluk	rewitîn	: yaprak dökmek
dilxişûş	: kuşkucu	sîtil	: kazan
dûn	: sıvamak	sûn	: bilemek
gan	: çiftleşmek (bigê)	şik	: kuşku
havil	: yarar	şiverê	: patika
hemîn	: madem	temen	: ömür
hevkar	: meslektaş	têgih	: anlam, kavram
hevpar	: ortak	veniştin	: konmak (kuş)
hilawistin	: asmak	viritîn	: tehlikede olmak, yıkıma doğru gitmek
jentîn	: vurmak, taramak	wekok	: örnek
kapan	: basamak	xişûş	: teredût
kezixandan	: budamak		

Çîroka Helîmê

Beşîr BOTANÎ

Helîm keçeka 13 salî ye li gundek ji gundên Botan jiyabû (Girgê Emo - Zaxo). Her dem bi keçan re dihate kaniyê û lawekî cotyar hejê kir... Careke Helîm bi keçan re nehate ser kaniyê, lawik bêzar bû û nezanî ji ber çî... Ya ji wî ve Helîm nexweş e. Paşê wî dît ku Helîm bi tenê tê ber kaniyê û zanî ku ew her ya wî ye. Û diyar e ku wê divê delîveka bide wî û pêre baxive... Ev herdû evîndarên he digehine hev, lê dûmahîka evîna wan jîn li wan tal dibe. Û dêbavên Helîmê dota xwe nadine lawî. Edî wî Helîm revand û bire gunda Girka Mehmê Emoyê. Ûzêrî birayê Mehmê Emoyî evîna wan pîroz nekîr û nepejirand, paşê Helîm dayê destê dêbavan. Hingê cengeka mezin li Cizîra Botan li navbera Kurd û leşkerên Osmanî dibe. Bi hezaran Kurd tene girtin û kuştin, û Mehmê û Ûzêr du kes ji wan yên ku li zindanê tèn kuştin. Yarê Helîmê jî, birîndar bû û bû mişext û derbider.

Strana Helîmê

**Muzîk: Kurdî-Beyat, Heyranok
Naverok: Lawik**

Lêlê Helîm Reben,
were were were were
lê wer Helîmê

Canê ezê çî b'kim,
Ji derdê hevînê

Lêlê kiçkê dînê rebenê
te tengziravê, soreşînê

Ax were were were were
ax yar Helîmê

Lêlê kubarê l'xekê tehlê,
l'mî' şîrînê

Ax eman eman eman eman
ji derdê vê jînê

Lêlê Helîm reben, li gundê me
sê kanî ne

Canê ev sê kanî av-tazî ne
Eman ramûsanên me

şepalê helalî ne
Ax were were were were

ax yar Helîmê
Mi' go' l'xekê kirêtê

l'ber dilê min ciwanê
Ax eman eman eman eman

te reşrîhanê

Lêlê Helîm reben, te d'go'
ez we nakim, ez we nakim

Kirasekî melesî kitan,
l'xwe nakim

L'serê Sîpanê Xelatê befr û bager e
û ez îdare nakim

Ax were were were were
ax yar Helîmê

Kiçkê dînê de rabe xwe berhev ke,
çavê mi' di rê da

Ax eman eman eman eman
teşî d'rêsî l'ber malê da

Lêlê Helîm reben

te fîstansorê Amêdiyê

Canê te kofîxwarê Dihokiyê
Canê te şûtikrengînê Şernexiyê

Hawar e de ramûsanekê
b'de min, bi xweşiyê

Ax were were were were
ax yar Helîmê

Ji bänderê ezê te birevînim
û dîr bikevim ji vê derê

Ax eman eman eman eman
te bejinbilindê, xizêmzerê

Lêlê Helîm reben,

were were were were,
delalê were

Canê singê te zozan e,
ezê bibim j'xwe re
Eman pevçûna me hemya j'ber te
bû, b'top û xencer e

Ax were were were were
ax yar Helîmê

Mi' go' zozan xweş bûne,
em dê çînê

Ax eman eman eman eman
l'wî çiyayî, l'Fereşînê

Lêlê Helîm reben,

were were were were,
ax yar delalê

Canê ez nexweş im, l'nîva malê
Xwezî j'xêra Xudê ra em bibayna

bûk û zava, l'serê vê salê
Ax were were were were,

ax yar Helîmê
Hewar e mirî me û de nîzîk be ji min,

hey dengbilûrê
Ax eman eman eman eman

te çavreşê, gulîhûrê

Gundîno j'ber min Helîmê

l'tara jorî, tenûr dada

Rabû û l'tara navîn, medrûm bada
Hewar e û l'tara xwarî, rîhan av da

Xwezî Xudê miradê me hasil kiriba
Nav doşek û lihefê qedîfê da

Ax eman eman eman eman
j'derdê vê dinyayê

Gundîno, mi' Helîm dît û
mi ew nas nekîr

Mi' ew revand Girka Mehmê Emo,
û qebûl nekîr

Hewar e Ûzêr birayê Mehmê Emo
l'mî' mar nekîr

Ax ne mînim ne, mînim
j'bo yar Helîmê

Dinê lê dinê xwarna gurî bizinê,
ev çî jîyan e

Ax eman eman

Botan ava bû û niho wêran e

- HEW -

Jêder: Ez vê stranê ji pîra Bedriya Cizîrî (74 salî) fêr bûme, wisan ji dayika xwe. Û çîroka wê jî, ji Naza Goyanî... (Beşîr BOTANÎ)

w e l a t o

KAWA

kurê min, lawo!
 nayê guhê te dengê Kawa
 vaye çend hezar sal in
 di nav zîncîr û zindanan de
 di nav zilm û kuştinê de me

dota min, keçê!
 nayê guhê te
 qêrîn û gaziya min
 me bi şîrê sipî mezin kirin
 ev zarokan
 niha xwîna sor dirije
 li ser wan

hûn dilê min
 ez li çar perçan dinalim
 wek zelzele dihejîm
 bavêjin tirs û xofê
 Ji dilê xwe
 şer wek agir pê dikeve
 di nav dilê min de
 zarokên min, lawên min
 keçê min, kal û pîrên min
 ezê ji dijmin re bibim gor
 ji serhildanê re bibim roj
 cejna min, ew roj e ku
 hûn li ser min hêşîn bin
 û rengê kesk û sor û zer
 bigere li ser min
 wekî bayek germ

welato,
 doza me
 serxwebûn û azadiya te ye
 li vê dinê
 jana dilê te
 bi cejna Newrozê
 bibe şayî
 û nemîne li ser te
 zilm û koletî
 tu bi deşt û zozanan
 bi gund û bajarên
 dê kengî serfiraz bibî
 ezê bikenim wê demê bê xem

hûn dolê min
 heyfa min ew e kû,
 cahşê nav we

dernaxin ji stûyê xwe
 şebeka koletiyê
 li çar ciyan dimêjin xwîna min
 ev neyaran
 hûn yek bin,
 doza min bilind kin wek çiya
 ezê wê demê
 bişewitînim bi agirê Newrozê
 ew dijminên ku
 xwîna min dimêjin li çar ciyan

welato,
 em bûn li girtîxanan
 di nav zilmê de
 hêz nema di dêst û piyê me de
 xew neket çavê me
 xwarin û vexwarin tunebû
 heya kuştina me,
 lê dîsa me doza te nexist
 nav dest û lîngan
 keç û xort
 bi canê xwe
 pê xistin agirê Newrozê,
 em dizanin ku
 heta tu azad û serbest nebî
 roj dernayê li ser me,
 û jiyaneke rind nayê ber me

roj bi roj
 sal bi sal
 dê xerabtir bibe jiyân
 heta serhildan mîna govêndê
 bi çar aliyên te nekeve

hûn dewlên min
 ez ne ji Romî re
 ne ji Ereb re
 ne ji Ecem re
 nabim erd
 nabim welat
 jiyana min ji bo we ye
 ez welatê Kurdistan im


pênc hezar sal in
 ez gula kesk û sor û zer im
 ez dilê sipî me
 germ im wek xwîna sor

girtî me bi çar alîdor
 rabin êdî sebra min nema
 hêrsa min wek kêreke tûj e
 bes e koletî
 dixwazim serbestî û azadî

welato
 em te nadin û nahêlin
 ji Rom û Ereb û Ecem re
 heta canek bimîne
 li ser deşt û çiyayên te
 ji bîra me naçe
 Dêrsim, Agirî û Helebçe
 her stranekî me dibe wek top û
 tîfing
 em Kurd in û keç û lawên te ne
 sebra hezar salan
 li piştta me pir giran e
 em li her çar perçan
 kevir dihêrin
 xwelî dixwin
 û em te nahêlin li bin lîngan

hûn dewlên min
 diqîrim, bang dikim
 erd û ezman dikim yek
 û ji dijmin re dikim gor
 ji bo serxwebûn û azadî
 ezê bi xwîna sor
 xwe bişom
 heta ala min bilind be
 û bigere li ser min.
 tu sebra hezar salan î
 di nav dilê min de
 bes e êdî diteqim
 wek top û tîfîngan
 ez dayka Kawayê Hesinker im
 di çavên min de tirs,
 di dilê min de xof tune
 bi çar perçên xwe ve radibim
 bitirsîn ji min
 ey dijmin!
 ez Kurdistan im
 û dayika Kurdistan im

KAMUOYUNA



Halkların mutluluğu, zulüm ve soygun düzeninin ortadan kaldırılması ve düzene alternatif olma amacıyla kurulan partimiz, diğer siyasi partilerden çok farklı bir programa sahiptir. Partimiz Türkiye’de birçok sorunun yanında öncelikli olarak demokrasi ve özgürlük mücadelesini kendisine ilke edinmiş bir siyasi partidir. Bu mücadelede katledilen parti yönetici ve üyelerimizi saygı ve rahmetle anıyoruz.

HEP’İN BUGÜNE KADAR ÖLDÜRÜLEN YÖNETİCİ VE ÜYELERİNİN LİSTESİ

1. Vedat AYDIN
2. Remzi İL
3. Harbi ARMAN
4. Abdurrahman SÖĞÜT
5. Ahmet TURAN
6. İsmail IRMAK
7. Sıddık TAN
8. Ekrem GÜran
9. Musa ANTER
10. Hüseyin DENİZ
11. Abdulsamet SAKIK
12. Nedim BALLYACI
13. İsmail HAKKI KOCAKAYA
14. Tahir SEYHAN
15. Mehmet DEMİR
16. Mehmet Sait ERTEN
17. Abdülkadir KİŞİ
18. Selim BİNGÖL
19. Mehdi DEMİR
20. Mevlüt ARGİN
21. Şahin ALPAN
22. Adil YAZICI
23. Nezih DOĞAN
24. Halit TEMLİ
25. İsa BULUT
26. Ekrem GÜRNÜ
27. A. Sıddık TURHALLI
28. Sait MENTEŞ
29. Mehmet Emin NARİN
30. Rodi DEMİRKAPI
31. İdris ÇELİK
32. Yusuf SOLMAZ
33. Misbah DOĞRU
34. Abdulsamet ÇETİN
35. Nihat MAZHAR
36. Felemez GÜNEŞ
37. Bahattin TURAN
38. Behzat ÖZKAN
39. Zülfükar YAĞAN
40. Nevzat KELEKÇİ
41. Havzi EKİNCİ
42. Mustafa ATAN

HEP GENEL BAŞKANLIĞI



Buha: 12.000 TL.